

# ROJNAMEGERÎYA KURDÎ YA DÎJÎTAL

2020

BOTAN INTERNATIONAL
RSF WITH THE SUPPORT OF REPORTERS WITHOUT BORDERS
This project is funded by the European Union

# ROJNAMEGERÎYA KURDÎ YA DÎJÎTAL

BOTAN INTERNATIONAL

**Murat BAYRAM**
Edîtor

**Rûken HEKARÎYAN**
Berhevkar

**Ridwan XELÎL**
Rûpelsazî

**GRAFÎKURD**
Bergsazî

**02/2021**
Dema Belavkirinê

# PÊŞGOTIN

**EROL ÖNDEROĞLU**
NÛNERÊ RSFYÊ YÊ TIRKIYEYÊ

Demekê dirêj e karên baş ên ji bo zimanê kurdî li welatên wek Fransa û Swêdê dihatin kirin û xelkê herêmê xweziya xwe bi wan karan dianî.

Demekê dirêj e em li bendê bûn xizmeteka pirhêl û piralî ya ne bi sîyasetekê ve girêdayî li herêmê bê kirin.

Em li bendê bûn minaqeşe li ser rojnamegerîya Kurdî li cihê ku rayên wê lê ye bê kirin. Em li benda xebatên welê bûn ku divîya bi nêrîneka civakî, çandî û pîşeyî li rojnamegerîyê û kêşeyên wê yên rojane binêrîya.

Di demekê de ku di sektora rojnamegerîyê ya Tirkiyeyê de dîyalog ketiye di rewşeka xerab de, ev karê hatî kirin gelek kes bi mijarên ji hev cida gihandine hev.

Rojnamegerên Sînornenas (RSF) li hemî derên dinyayê hewil dide alîkariya parastin û bipêşdebirina azadiya xwe-îfadekirinê bike. Ji ber wê yekê piştgirîya karên bi vî rengî yek ji erkên wê yên sereke ye.

Ez dibînim ku li Botan Internationalê karekê profesyonel li ser destên mirovên profesyonel hatiye temamkirin.

# NAVEROK

## ROJNAMEGERÎYA KURDÎ YA DÎJÎTAL

**Edîtorya**
Botan International ........................................ 03

**Naverok**
Botan International ........................................ 04

**Di okyanosa dîgîtal da bahoza enformationê û qaptanê nezan**
Ali Duran Topuz ........................................ 05

**Di medyayê de hevpeyvîn çawa tên amadekirin?**
Ferîd Demirel ........................................ 10

**Amadekirin û pêşkêşkirina vîdeo-nûçeyan**
Gulistan Korban Rençber ........................................ 13

**Podcast çi ye?**
Hatice Kamer ........................................ 16

**Nivîsîna nûçeyên ji bo medyaya dîjîtal**
Omer Faruk Baran ........................................ 20

**Ajansên nûçeyan û nûçegihaniya ajansan**
Rêdûr Dîjle ........................................ 23

**Rojnamegerîya jinên kurd**
Safîye Alagaş ........................................ 27

**Nûçegîhanîya wêneyan**
Sertaç Kayar ........................................ 32

**Mafên bikarhêner û nûçegihanên medyaya dîjîtal**
Şîraz Baran ........................................ 34

**Hevokên kompleks û hevokên relatîf**
Îbrahîm Seydo Aydogan ........................................ 40

**Rojnamegerîya edebî**
Murat Bayram ........................................ 50

**Peyamnêrîya cengê**
Mesûd Mûhemmed ........................................ 56

**Beşa Semîneran**
Muri Darida • Isabel Kaser ........................................ 59

*Ji bo giyanê*
*Celadet Alî Bedirxan*
*û Roger Lescodî*
*…*

*Em ji bo hevkarîya we spasdar in,*
*mala we ava be*
*Laëtitia Chesseron û Léa Tardie*
*…*

# DI OKYANOSA DÎGÎTAL DA BAHOZA ENFORMATIONÊ Û QAPTANÊ NEZAN

**ALI DURAN TOPUZ***
GAZETE DUVAR

*Ali Duran Topuz li Zanîngeha Stenbolê Beşa Hiqûqê xwendiye. Ji sala 1994an ve ew li gel parêzrîyê jî di gelek radyo û rojnameyan de jî xebitiye. Di avakirina rojnameyên Akşam û Radikalê de jî cî girtiye û di Radîkalê de gerînendetîya karên nivîsê kiriye. Di Radyo Sputnik û IMCyê de pêşkêşvanîyê dike. Her weha ew di gelek kovaran de jî li ser hiqûq, jiyana xebatê û sîyasetê jî dinivîse û berpirsê weşana Gazete Duvarê ye.



Hûn hêvî dikin ez ê li bin sernavên ku bi sê peyvan ve hatiye saz kirin ji we ra biaxivim û ev axaftina min jî ne axaftineke alelade be û ne jî ji rêzê be lê divê axaftineke taybet, wekî dersê be. Wisa xûya ye ez ê bi daxwaza lêborînan dest pê bikim. Ne bi lêborînekê bi lêborînan. Lêborîna ewil ji bo sernameya mijara me: Rêveberîya Medyaya Dîgîtal. Erê min nav lê nekir, lê ji ber ku min erênî daye vê sernavê, barê agahdarkirinê li histûyê min da darda ye.

Qala medyayê kirin ne zor e, asan e. Qala rêvereberiyê jî dîsa weha ye lê gava ku mijar hat ser peyva dîgîtalê, her tişt diguhere, berevajî dibe. Wekî ku hûn ji min baştir dizanin, piştî destpêkirina çaxên medyaya dîgîtal tiştên ku em wekî pişta destên xwe dizanin bi reng û toreyên nû derdikevin hemberî me, êdî em nizanin ew dest e an ço ye. Heke dest be û ço be jî ya kî an kê ye em qet nizanin. Axirî ji wê rojê vir ve li ser mijara me her ku diçe pirs zêde dibin, bersiv kêm dibin. Divê ez ji serî da ji we ra bêjim: di hişê min de pirs pir zêde ne û xwezî bersivek jî hebûya lê tune. Bi rastî ez him nikarim him jî naxwazim bersiva pirsan bidim lê ez dixwazim pirsên ku di hişên we de ne yekî lê zêde bikim.

## TIŞTÊ KU EZ DIZANIM Û HÛN NIZANIN ÇI YE?

Dive ez lêborînekê jî ji bo xusûsîyeta axaftina xwe ji we bixwazim, min qebûl kir ku ez ê dersekê bidim. Dersdayîn, wekî din hînkirin. Kî dersê didin? yên ku dizanin. Kî dersê digirin? yên ku nizanin lê dixazin hîn bibin. Lê tiştên ku ez dizanim û hûn nizanin çi ye? Bi rastî, ez jî wî tiştî nizanim. Tenê tiştekî dizanim ku ew her çibe bila bibe bi “medyaya dîgîtal” ve girêdayî ye. Erê, ez jî bi qasî we dizanim medya çi ye, rêveberî çi ye û heger mijara me medyaya konvansiyonal, yanî ya peymanî an jî lihevkirî bûya min ê bi asanî bigota belê, ez dûr û dirêj qala qeyde û qanûn û hûrûmûrên wê bikim.

## ROJ BI ROJ PIRS ZÊDE DIBIN LÊ BERSIV ZÊDE NABIN

Lîsteya lêborînan lîsteyek dirêj e, min jê tenê du heb vebijêrtin. Niha hûn ê ji min bipirsin: gelo tu bo çi hatî madem qet tiştekî nizanî? Ez jî wekî we ji bo lêgerîna bersiva pirsên ku wek baranê ji her deverên darê dinê dibarin hatim hemberî we. Ew pênc sal in ku ez di nav zikê medyaya dîgîtal da me, lê çi heye berî pênc salan ji xeynî blogekê tu têkîlîyê min bi karûbarên medyaya digital ve tune bû. Ev blog jî ne blog bû, min ev ji xwe re wekî defterekê bi kar dianî. Gava ku min erêniya xwe da projeya GazeteDuvarê, min di derheqê damezrandin û rêvebirina malperên dîgîtal a rojnamegeriyê de tiştek nizanibû. Ji wê rojê heta îro ez û hevalên xwe yên em bi hev re dixebitin, li bersiva van pirsan digerin. Roj bi roj pirs zêde dibin, bersiv na.

## GAVA KU MIN SERNAVÊN MAMOSTEYÊN HÊJA DÎT...

Piştî ku min banga Kargeha Rojnamegeriya Kurdi ya Dîgîtal qebûl kir, min got ez berê sernavên dersên din bibînim, paşê dest bi amadehîya xwe bikim. Gava ku min sernavên mamosteyên din ên hêja dît, hêvîyê min firîya, teselîya min ket. Dersên ku di vê kargehê de hatine dayîn an jî yên ku werin dayîn bi rastî jî ders in: Herkes dikare ji wan dersan tiştên bi feyde hîn bibe. Em du sernavan ji nav wan bigirin: “Zayenda civakî, jin û civaka kurdan” an jî “Gelo jinên kurd li medyaya Ewropayê çawa cih digirin?”

Gelo kî naxwaze wan meseleyan bizanibe an jî hîn bibe? Aha çend sernavên din:

» PodCastên kurdî çawa tên amadekirin?
» Taybetmendîyên wêneyên ji bo medyaya dîjîtal çi ne?
» Weşana zindî ya li Medyaya Civakî divê çawa be?
» Amadekirin û pêşkêşkirina vîdeo-nûçeyan

## RÊVEBIRÎN TÊ HÎNBÛYÎN, NAYÊ HÎNKIRIN

Ev her mijar şayesteyê hînbûnê ye. Di her mijarê de zanatî, hûnerî heye û kesek ji van yekî hîn bibe dikare ji xwe ra kareke baş bibîne û vê karê xwe jî baş çêbike. Hînbûna nûçe nivîsîn, wêne girtin, video çêkirin û tiştên dîtbarî taybet in û bi kêr in. Lê mijara min? Nebe ku mijara min tiştekî ne berbiçav, tiştek bêtaybet û bêkêr be? Bê henek, ew rast e!

**Belê, bi kurt u kurmancî bêjim, rêvebirîn belkî tê hînbûyîn, nayê hînkirin. Ji ber ku ew ne mijareke mişexes e, ne mijareke berbiçav e û ne jî bi hunerekê ve têkiliyên wê hene.**

Di qeyde û qanûnên rêvebirina medyaya kevn de zêde tevlihevî tûne bû: ev jî ji alîyekî ve dişibîya rêvebirina leşkerîyê, ji alîyekê ve dişibîya rêvebirîya dibistanan an jî rêvebirina perwerdegehê û ji alîyekê ve jî dişibîya rêvebirina karîstanê.

## MEDYAYA PEYMANÎ WEK PÎRAMÎDEKÊ YE

Teşeya avahiya medyaya peymanî wek pîramidekê ye: li qata binî kesên bêrayedar lê biwezîfe xwe şûnda digirin. Li ser her qatî kesên bikarbidestî cî digirin, ew kes ji jor ve talîmat û agahîyan digirin, ber bi jêr ve talimat, ferman û agahîyan didin. Yen jêrin jî karûbarên xwe û raporê xwe pêşkeşî yên li jor dikin. Li ser tapê pîramîdê jî berpirsê gîştî heye. Ew pîramîda li leşkergehê jî eynî wisa ye, li mektebê jî û li kargehê jî. Bi vê mekanîzmayê yan rojnameyek tê çêkirin an jî weşanên radyo û televizyonekê tên domandin. Berpirsyarê hemûyan wekî serleşkeran talîmatan dide, wekî hostayan agahdarîyê dike, wekî mamosteyan dersan dide. Ne ku divê yekî/yeke demoqrat be; belê ger demoqrat be baştir e lê ne hewce ye.



Lê roja îro, di rojên dîgîtalan de teşeya vê medyaya serobino bûye, berevajî bûye. Baş e ku wiha bûye. Em roja iro rojnameyeke bîst û çar rupelî bigirin ber çavên xwe, tê de herî zede 240 nûçe, bîst û pênc an jî sî û pênc wêne, nêzikî deh quncnivîs an jî gotarên şîroveyan cî digire. Her nûçe ji qat û pêlingên pîramîdê tê bêjingkirin. Rêveberê gîştî, piştî her kesî rûpelan an jî nûçeyan dibîne. Tê gotin ku her tim biryara dawî ya rêveberê giştî ye lê a rastî ev biryar jî girêdayê biryarên ku di her qatên pîramîde da hatine girtinê ye.

Sazgerîya vê pîramîda medyaya kevn pir baş dixebitî, ji ber ku ev ji dîroka medayaya konvansiyonel hatibû hilberandin. Lê ji bo weşanên dîgîtal ev mekanizmaya kevn weke rojên berê xweş nedixebitî.

Çima? Nûçeyên kû di pêvajoya bîst û çar saetî da em datînin li ser malperekê, têrî belkî sê belkî çar rojnameyan dike. Min go nûçe lê nav van da wêne, dîmen û tiştên bideng yanê podcast jî hene.

## GAVA KU BAHOZ DERKET,<br>KEŞTÎ RASTÎ KEVIREKÎ HAT...

Di medyaya dîgîtal de yê/ya ku li ser tapa pîramîdê rûdine, hebekî dişibe qaptanê kelek û keştîyan. Gava ku her tişt û her kes li şûna xwe û li ser karên xwe ne, tu karê wî qaptanê me tûne ye, xeynî ku di koşika xwe da rûniştîye û destên xwe danîye serhev. Gava ku tiştên nediyar xuya bûn, gava ku muretebat ket dudilîyan, gava ku bahoz derket, gava ku keştî rastî kevir û kuçan hat encax wê gavê divê ew ji kamaraya xwe derbikeve. Dîsa bi kurt u kurmancî, gava meseleyeke bêbersiv derket holê ev wê gavê dikare rola xwe bilîze. Ev rol jî yek e: ew ê barê wergirtina biryarên soxîn bigire histûyê xwe, bikeve di bin barê mesuliyete de. Ji ber ku muretebat her tiştî ji wî/wê baştir dizane, ew mecbûr e ku berê hizir, ramanên û bersivên muretebata xwe hîn bibe û paşê biryara xwe ya dawî bide. Îro kes nikare medyaya dîgîtal wekî medyaya edetî bi rê ve bibe. Di rojên berê da talîmat û ferman bes bû, lê îro kes nikare bi talîmat û fermanan keştîya medyaya dîgîtalê bi rê ve bibe. Rola qaptanê me berê dişibîya roleke teknîk an jî burokratîk lê îro ew rol ji binî ve guherîye û dişibe rolek sîyasî. Pîramîda me hilweşîyaye û him di nav xwe da û him jî di nav hev da pîramîden nû derketine holê û her ku diçe yên nû dikin derbikevin.

## MEDYAYA DÎJÎTAL<br>DI NAV BARAN Û BAHOZAN DE YE

Di dawîyê de qaptanê me yê bêkar, di çaxa medyaya dîgîtal da bi çavekê bitevayî betal wetal dimîne; ji aliyê din ve jî her gav divê li ser karê xwe be. Ji ber ku medyaya dîgîtal her di nav berf û baran û bahozan da ye. Divê em niha parîkî li ser peyva dîgîtalê bisekinin. Peyva digital maneya xwe ya ku îro em bikartînin di nav sîh an jî çil salên dawî de wergirtiye. Berî wê peyveke matematîkê bû.

Peyva medyayê jî wateya xwe ji danûstandina enformationê, yanê amadekirin û belavkirina agahîyan digire. Dema ku peyva dîgîtal ku hatîye ber peyva medyayê, maneya medyayê neguherîye lê xeynî ji maneyê her tiştê wê guherîye. Guherîna herî mezin, guherîna “medium” ê bû. Me ku qeziya Marshall Mc Luhan anî bîra xwe em dikarin maneya vê guherînê zelal bikin: “Medya, mesaj e.” Yanî, xeynî ji mesajên ku wekî nûçe, agahî û tiştên din ên ku li ser medyayê tên û diçin, mesajeke din jî heye û ev jî forma medyayê bixwe

ye, yanê medyum bixwe ye. Medyuma ku guherî divê her tişt jî biguherîne û wilo jî bû.

Îro ji vê guhertinê re şoreş jî tê gotin. Ev rast e jî. Dahêna nivîsê, îcada nivîsê pênc hezar û pênc sed sal berê niha bû. Ev şoreşeke pir mezin bû. Dahêna elfabetê nezîkê sê hezar sal berê bû. Dahêna xetê an ji kaxazê digihîje du hezar salan. Matbaa neh sed salan berê îro hat dahenandin, matbaa ya bi tîpen bizêv, biliv, pênc sed sal in ku hatine cem hev û matbaa û makineya dukelê ji çar sed sal in li ba hev dişixulin. Niha jî sîlîkon û ceryan hatin cem hev û şoreşa dijital derket holê.

## PEYDABÛNA ROJNAMEYAN Û PARÇEBÛNA ZANÎNÊ

Her yek şoreşeke dîrokî ye. Îcada nivîsê û peydabûna dewletê li ba hev in: Sumer, Asur, Hitit... Bi kaxazê ve dewletên emperyal li cem hev in: Misir, Çîn, Rom, împaratorîyen Misilmanan… matbaa û dûkel, ku ji rojnamegerî jî herduyan derket, tev emperyalizma du gelên rojavayî derketin sehneya dîrokê.

Peydabûna rojnameyan û parçebûn an jî ji hev cûdabûna zanînê di heman demê de ne: Zanîna zanîstî (knowledge) û agahdarî yan jî hayjêhebûn (information). Rojname, li ser enformasyonê hat damezrandin. Piştî ku rojname peyda bû, du fîgur ji hev cuda bûn: Nivîskar û xwendevan. Piştî ku radyo û televîzyon peyda bûn guhdar û temaşevan derketin holê.

Lê qeyde û qanunên rojname, radyo û televizyonê dîsa nêzikî hev bûn û ew jî di dîroka rojnamegerîyê de pêk hatibûn. Bingeha wan dîsa rojnamegerî bû. Lê îro roj, guherîna herî mezin dîsa di zanînê de çêdibe: Divê rojnameyeke dîgîtal him zanîna zanistî û him jî enformationê bi hev re bikarbîne. Enformation îro ne tenê karê sazûmanên rojnamegerîyê ye, lê dewlet, şîrket, rêxistinên sîvîl û takekesên civatê bixwe bilez û bez her gavê informationê çêdikin û belav dikin.

## HERKES HIM XWENDEVAN E HIM JÎ NIVÎSKAR E

Rojnamegerîya konvantionel nivîskar û xwendevan ji hev cûda kiribû, rojnamegerîya dîgîtal dawîya wê cudahîyê anî; îro herkes him xwendevan e him nivîskar e. İnformation îro wek baranê li ser herkesî da dibare. Ew baran jî ne baraneke xweş û geş e lê baraneke xeternak e, wekî Paul Virilo dibêje ew barana wek bombeyan li ser her kesî û her civatê dadiweşe. Rêveberîya medyaya dîgîtal îro berî her tiştî divê sînora xwe keşf ke û dîyar bike. Di medyaya kevn de sînor li ber çavan bû, hejmara rûpelan bisînor bû, radyo û televizyon jî bi dema xwe ya weşanê ve hatibûn sînor kirin. Lê di medyaya dîgîtal da qet sînor tüne ne, divê rêveberîya wê sinorên wê kifş bike.

Guherîneke mezin jî di mijara demê de derket holê: berê taybetîya medyayê şipbûn bû, tewsa wê bû. Fonksiyoneke rêvebirina medyaya konvantionelê, zêdekirina tewsa her tiştî bû, lezandin bû. Lê îro ev wezîfe berevajî bûye: îro zêdekirina tewsê ne tiştekî baş e, îro sekinandina lezûbezê mecbûrî ye. Xwesînorkirin, nûçe bijartin û sekinandina ku bi lez û bezê nebe, keştiya me nav berf û baran û bahozan da bi nav dibe.

Min bi lêborînan dest pê kiribû û lêborînek jî bo ders dayînê ji we xwastibû. Dixwazim dîsa bi mijara dersê paşîya qezîyên xwe bînim: di okyanosa medyaya dîgîtal da qeyde û qanûna herî mezin a rêvebirinê hînbûn e ne hînkirin e, dersgirtin e ne derdayîn e.

# DI MEDYAYÊ DE HEVPEYVÎN ÇAWA TÊN AMADEKIRIN?

**FERÎD DEMIREL***
BIANET

* Ferîd Demirel, Edîtorê Bianet Kurdîyê ye. Ji Zaningeha Marmarayê, ji beşa Rojnamegerîyê derçûye. Û niha dîsa li Zaningeha Marmarayê di beşa Rojnamegerîyê de masterê dike. Di rojnamayên Birgün, Dicle Haber Ajansı (DİHA), Dem Tv, Rûdaw Tv û Sputnik Kurdistanê de wek nûçegîhan, edîtor, gerînendeyê nûçeyan û şef edîtor kar kiriye.



Pirs/pirskirin, bingeha karê rojnamegiriyê ye. Pirs û lêgerîna bersiva pirsan, tiştên esasî ne di karê rojnamegeriyê de. Pirsa ku rojnameger ji xwe bike, dibe ku bibe destpêka nûçeyekê ango hevpeyvînekê.

Ez ê îro ji we re behsa hevpevyînan bikim. Lê beriya wê, divê em tiştekî zelal bikin. Di dezgehên medyayê de û rojnameger gelek caran hevpeyvîn û roportajan li şûna hev bi kar tînin. Roportaj û hevpeyvîn du tiştên cuda ne.

Roportaj di rojnamegeriyê de tişta herî zêde nêzîkî wêjeyê ango edebiyatê ye. Di roportajê de çîrokbêjî heye. Li gorî nêrînekê, roportaj di navbera edebiyat û rojnamegeriyê de ye. Ji ber vê jî romana Tolstoyî ya bi navê «Şer û Aştî»yê jî weke roportajeke bêhempa tê dîtin.

Pirtûkên George Orwell, Jack London, Mark Twain, Ernest Hemingway, John Hersey weke mînaka rojnamegeriya edebî ango roportajê ne. Dîsa li Tirkiyeyê Yaşar Kemal, Fikret Otyam û Ara Güler jî nûnerên vê cûreyê ne. Robert Fisk, rojnamegerê amerîkî yê ku beriya demekê koça dawî kiribû jî yek ji wan e.

Di rojnamegeriya kurmancî de em zêde rastî vê cûreyê nayên. Hin rojnamegeran dem bi dem bi vî awayî nûçe nivîsandine lê di rojnamegeriya kurdi ya kurmancî de zêde mînakên vê cureyîê nîn in. Ez dikarim roportajeke Gunay Aslanî weke mînak nîşan bidim. Aslanî di hejmara yekem a rojnameyê de 29ê Çiriya Paşiyê ya 1991ê de bi ser navê “Xwîn Diherike Ji Malazgirê” reportajek nivîsandiye. Wê demê li gundekî Milazgirê cendermeyan gundî desteser dikirin û li qereqolê îşkence li wan dikirin. Gunay Aslan bi gundîyan re diaxive û çavdêriyên xwe jî lê zêde dike û weke roportaj diweşîne.

Dîsa ez dikarim behsa pirtûka Murat Bayramî ya bi navê “Belkî Îşev Binive” bikim ku bi qasî ku ez dizanim di kurmanciyê de yekem e. Bayramî di vê pirtûkê de behsa şerên Cizîr, Sûr, Nisêbîn û çend navçeyên din dike ku çavdêriya wan kiriye.

Piştî vê destpêkê em vegerin ser mijara xwe ya esasî. Yanî em behsa hevpeyvînan bikin.

Me got karê rojnamegeriyê û bi wê ve girêdayî hevpeyvîn bi pirsan destpê dike. *Divê rojnameger ji xwe bipirse, “Ez dixwazim çi fêr bibim?”*

*Her weha ev pirs jî girîng in: “Xwendevan, şopîner, temaşevan, guhdarên min dixwazin çi bizanin?”*


*Bersiva van pirsan wê rojnamegerî ber bi mijara hevpeyvînê ve bibe.*

*Ji bo çêkirina hevpeyvînekê hinek qonax hene. Amadekarî, têkiliya bi çavkaniyan re, pirs û guhdarkirin, şopandin. Herî dawî jî deşîfrasyon û weşandin. Rêza van qonaxan car caran cihên xwe diguherînin. Lê cihê her qonaxê li ku be jî ferq nake. Di dawiya dawiyê de divê qonax bi qonax pêk were.*

*Ev qonax ji bo hemû platforman hema hema weke hev in. Tenê teknîk û hin detay cuda ne lê di hevpeyvîna televizyonan de jî, di ya radyo û podcastan, di ya rojname û kovaran de jî heman qonax hene.*

Di qonaxa amadekariyê de tişta herî girîng, piştî diyarkirina mijarê, lêkolîn e.

Clyde Haberman ji bo hevpeyvînê wiha gotiye: “Lêkolîneke berfireh hîmê esasî yê hevpeyvîneke serkeftî ye”



Lêkolîn ji bo hevdîtinê gelekî girîng e.

Beriya her tiştî divê senaryoyeke te hebe. Bêyî senaryoyê ango plansaziyê tişta ku tê xwestin baş birêve naçe.

Em dikarin formulasyona vê qonaxê wiha çekin:

» Lêkolînê bike.

» Mijareke demkî ji bo çîroka xwe diyar bike. Armanca sereke ya hevdîtinê ew e ku rojnameger jêgirtin, anektod û delîlan bi dest bixe.

» Pirsan amade bike.

» Bila nêrîneke we di derbarê hevpeyvînê de hebe. Van pirsan bikin û bersiva wan diyar bikin: Wê hevpeyvîn çawa destpê bike, çawa bi rê ve biçe? Kesê ku tu hevpeyvîn pê re dikî wê çawa tevbigere û yên din.

Ev plansazî ango senaryoya ku di vê qonaxê de were amadekirin wê hêsaniyê di kar de bike. Wê bibe rêber ji bo hevpeyvîna ku tu dixwazî bikî.

John Brady, nivîskarê pirtûka «Hunera Hevpeyvînê» ji bo vê mijarê wiha gotiye: *“Gotûbêjkarê/a xurt, dizane ji hevpeyvînekê çi armanc dike.”*

Piştî van tiştan dem û cih in ku wê hevpeyvîn lê bê kirin tên diyarkirin.

Berîya çûna hevpeyvînê, amadekariya teknîkê heye. Di hevpeyvînên ji bo televizyonan de kelûpel hinekî cidatir in lê ji bo yên din kêm zêde weke hev in. Pênûs û lênûskek, kamerayek, heke hewce bike laptopek û cîhaza dengtomarkirinê divê li ba te hebe. Di roja me de telefonên mobilê cihê kamera û cîhaza dengtomarkirinê jî digire. Divê tu van kelûpelan kontrol bikî û heke kêmasiyên wan hebin divê tu tiştên kêm temam bikî.

Roj hat û tu çû cihê hevpeyvînê, divê tu derûdora xwe kontrol bikî. Cihê ku hûnê lê rûnên divê ne zêde qerebalix be da ku hûn bikaribin hev baş bibihîzin.

Di dema hevpeyvînê de bi qasî pirsan bersiv jî girîng in. Yanî guhdarkirin. *Brady kesê/a hevpeyvînê dike weke lîstikvanekî/e kişikê dibîne.*

*Pirsa xwe bike û bisekine, guhdar bike. Carl Bernstein, yek ji rojnamegerên ku bûyera Watergate-ê derxistiye holê û di encamê de Nixon, Serokê DYAyê dest ji kar berdabû wiha gotiye: «Nûçegihanên serkeftî ew in ku yên gelekî baş guhdar dikin.»*

*Di encama van tiştan de hevpeyvînek pêk tê û qonaxa herî dawî ya deşîfrekirin û weşandin e.*

# AMADEKIRIN Û PÊŞKÊŞKIRINA VÎDEO-NÛÇEYAN

**GULISTAN KORBAN RENÇBER***
ORTADOGUNEWS

*Gülistan Korban Rençber di sala 2013an de li bajarê Amedê li televizyoneke heremî ya bi navê Gun Tv'ye bi nûçegihantîyê dest bi kare xwe yê Rojnamevantîyê kir. Piştre derbasê televizyona bi navê Azadî Tvyê bû û li wir edîtorîya nûçeyên Kurdî kir û nûçey pêşkeş kirin. Bi girtina Azadî TVyê re di 2016an de li malpera 1HaberVarê wekî edîtora nûçeyên Kurdî dest bi kar kir û di heman demê de malperêbernameyek çêkir û pêşkeş kir. Her wiha, bernameyeke gerê çêkir û li 24 bajarên Bakurê Kurdistanê geriya û ew dan nasîn. Niha jî li malpera Ortadoğu Newsê di çarçoveya projekê de kar dike û her wiha ji televizyona NRTyê re nûçeyan çêdike.



## AMADEKIRINA NÛÇEYÊN BI VIDEO

Di karê rojnamegeriyê de her kar li gorî xwe zehmetiyeke di nava xwe de dehewîne, lê ger rojnameger di karê xwe de zana û serkeftî be wan zehmetiyan dadixe asta heri xwarê.

Amadekirina vîdeonûçeyan kareke hêsan e. Lê ger rojnameger bizane nûçeya xwe çawa saz bike.Vîdeo-nûçe jî wekî her cûre nûçeyan ji destpêkê heta dema weşanê yek bi yek ji hin qonaxan derbas dibe.

Ji bo amadekirina nûçeyê qonaxa yekemîn û ya herî girîng jî amadekarîya berî çûna qadê ye. Helbet ji ber ku nûçe, video-nûçe ye amadekarîyeke bê kêmasî ku ji amûran û teknîkê pêk tê pêwist e. Divê nûçegihan û kameramanê ku hevkarîya nûçegîhanê dike hemû amûrên xwe tam bikin û amade bikin.

Amadekarîyeke din jî lêkolîn e, ku divê nûçegîhan berî biçe qadê mijara xwe diyar bike û vê mijarê ji her hêlê ve bikole.

Hewce ye nûçegihan di dawîya vê lêkolînê de bizanibe ka wê biçe ku, çi taybetmendîyên vî cîyî hene, kî li vî cîyî dimînin û çi eleqeya wan pê heye û hwd.

Nûçegîhan ji van zanyarîyan agahdar be wê demê dikare berî biçe qadê senaryoyeka nûçeya xwe di serê xwe de amade bike û gava çû karê xwe bi rihetî pêk bîne.

Ger van tiştan pêk bîne di dema nivisandinê de wê bê zehmet bikaribe nûçeya xwe bi nivisîne.

Amadekirina videonûçe kareke hevpar e, ji ber yekê divê nûçegîhan û kameraman bihevre tev bigerin.

Nûçegihan dema çû nûçeyekê çêbike hewce ye ku dîmenên divê bên kişandin nîşanê kameramanî bide û karê kameramanî jî hêsantir bike.

Di vîdeonûçeyan de dîmen geleke girînge. Ji ber ku gelek tiştan dîmen tîne ziman, ên kêm man nûçegihan bi metna xwe temam dike.

Di amadekirina vîdeonûçeyan de çend xalên sereke hene:

- Ya yekemin; divê ziman vekirî, kurt û herikbar be, peyvên zêde neyên bikaranîn.
- Ya duyemîn divê tiştê di dîmenê de di metnê de jî neyê dubare kirin.
- Dirêjbûna nûçeyê jî divê 3 deqîqeyan derbas neke.

## PÊŞKÊŞKIRINA NÛÇEYAN

Pêşkeşiya nûçeyan bi xwe kareke geleke giran e û berpirsiyarîyeke zêde dixwaze.

Lê ger pêşkeşvan bi zimanê xwe û bi xwe bawer be wê demê wê di karê xwe de jî geleke serkeftî be.

Di karê pêşkeşiyê de xalên herî girîng, ziman û zanebûn û dîksiyon e.

Divê pêşkêşvan bi zimanê dayîka xwe yan zimanekî ku bi qasî yê dayîka xwe dizane pêşkêşvanîyê bike. Lewra ziman girîngtirîn xal e di pêşkêşvanîyê de. Lazim e ku zimanekî resen, sivik, herikbar, bê bi kar anîn. Lewra her cûre mirov, ji her çîn û qadê mirov temaşe dikin divê her kesê temaşe dike agahîyên tên dayîn bistîne.

Ji aliyê din ve pêşkeşvan divê bi xwe bawer be û wê bawerbûnê bide kesên ku wê/wî temaşe dikin.



Vê peyamê dikare bi deng û sekna bide kesên li hember xwe.

Divê şêwaza pêşkêşvanî/ê bi dengekî bilind û bibandor be. Şêwaz tesîreke mezin li temaşevanan dike. Ji bilî qelîteya agahîyên tên dayîn şêwaz jî dike ku temaşevan biryara temaşekirinê bide.

## BIKARANÎNA DIYAFRAMÊ

Di nûçe-vîdeoyan de xala din a girîng jî bikaranîna diyaframê ye. Ji bo pêşkeşvaniyê bêhngirtin û kontrola bêhnê pir muhîm e. Ji ber vê yekê ji % 90 pêşkeşvan bêhna xwe ji zikê xwe ango ji dîyaframê digirin.

Ji bo axaftineke zelaltir, ji xwe bawertir û herikbartir bikaranîna dîyaframê ji xalên sereke yên vî karî ye.

Her wiha divê pêşkeşvan di nûçeyên xwe de bê alî û bê şîrove, bi rayê giştî parve bike, şîrovekirina nûçeyê ji temaşevanên xwe re bihêle.

## PIRS

**Wexta bûyerek ji nişka ve biqewime wê komposîzyona wê bûyerê çawa be?**

» Divê tu bi çavê rojnamegerekî li bûyerê binêrî.

» Divê tu lê binêrî û ji derdora xwe bipirsî çi çêbûye, çi qewîmîye li vir.

» Divê tu bi wan kesan re biaxivî ew ên ku dema bûyer diqewimî li wir bûn.

» Divê li cihê bûyerê çavderîyeke baş bê kirin.


» Divê tu hinek agahîyan binivîsî û dimenan bigirî.

» Divê di dawîyê de nûçeya xwe li gorî wan dîmen û nivîsan saz bikî.

# PODCAST ÇI YE?

**HATICE KAMER***
BBC, SBS

*Nûçegihana beşa tirkî ya BBCyê ye. 10 sal in ji bo beşa Kurdî ya VOAyê nûçeyan çêdike. Ji bo radyoya SBSyê ya Awistiralyayê û WDRya Elmanyayê nûçeyan çêdike. 2003yê li Gün TVyê dest bi karê rojnamegerîyê kiriye û ev 17 sal in rojnamegerîyê dike. Ji navçeya Farqînê ya Diyarbekirê ye.



Podcast berhemên deng û vîdyoyên medyaya dîjîtal in ku ew berhem dikarin li ser telefon, kompûter û tabletan bên tomarkirin û di her wextî de bi rêya wan bên guhdarkirin.

## ÇI AVANTAJ Û TAYBETIYÊN PODCASTÊ HENE?

» Bikarhênerên Podcastê dikarin bi rêya abonetîyê xwe bigihînin rêzepostcastan.

» Bikarhêner di her kêliyê de dikarin bi rêya podcastan hînî tiştekî nû bibin.

» Di salên dawî de podcast herî zêde ji bo perwerdehî, kar, keyfê tên bikaranîn.

» Her podcastek dikare gelek caran bê guhdarkirin.

» Bê rêya abonetîyê beşên nû yên podcastan dikarin bên bidestxistin.

» Bi rêya telefon yan jî compûterekê podcastek dikare bi hêsanî bê çêkirin û weşandin.

## HIN AGAHÎYÊN BALKÊŞ

» Li gorî daneyên 2018an li ser İtunesê 525 hezar podcast û 18 hezarî zêdetir beş hene.

» Li 155 welatan bi 100 zimanan weşan hatine kirin.

» 2014an de 7 milyar podcast hatine tomarkirin.

» Di adara 2018an de li ser apppodcastê 50 milyar podcast hatine daxistin.

» Her guhdareke podcastê di hefteyekê de kêm zêde heft podcastan guhdar dike.

» Ji sedî 49 guhdar podcestan li malê, ji sedî 22yê wan di rê de û dema erebeyê dajon gohdar dikin.

» Bi pêşketina telefonê biaqail, ji 2014’an vir ve gohdarikirina podcastan ji sedî 157 caran zêde bûye.

» Ji 2017an heta sala 2018an jî ji sedî 14 zêde bûye.

Piranîya guhdarên podcastan ji destpêkê heta dawîyê guhdarîya podcastê dikin.

## DI AMADEKIRINA PODCASTAN DE TIŞTÊN LAZIM ÊN KU DIVÊ BÊN ZANÎN

» Temaya sereke ya podcastê çi ye?

» Ji bo ragihandina vê temayê yan jî vê mijarê cihê herî baş podcast e?

» Gelo bi vê weşanê tu çi ji xwe re dikî armanc?

» Cudahiya weşana te ji podcastên din heye?

» Gelo li ser vê mijarê tu çiqas xwediyê agahîyan î?

» Ji bo vê mijarê tu çiqas bixwestek î?

» Tu dikarî berdewamîya weşanê bînî?

» Tu dikarî herî kêm 7 an jî 10 beşan amade bikî û biweşînî?

» Ji bo ku her beşekê herî kêm du sê roj lazim in; mijar, mêvan, naverok, tomarkirina dengî, montaj û weşan...

» Wekî din ji bo weşanê kompaniyek hostîngê, domaînê mesrefek wê heye. Gelo tu dikarî mesrefa wan heta beşa dawî bi xwe peyda bikî? ********

» Gelo wextê te yan jî çavkaniyên te têrî mijara potcastê dikin ew podcast ku bi rêkûpêk temam bibe?

» Gelo hûn ê bikaribin guhdaran bi kelecan bikin da ku heta dawiyê guh bidin podcasta we. Hewce ye kelecana poscastçêker wekî roja pêşîyê be lê divê di karê xwe de profesyonel tevbigere.

» Divê podcastçêker bizanin ka dixwazin ji kê re çi dibêjin, gelo  mijara we xort in, kal in, jin in?

» Divê podcastçêker li ser wê yekê bisekine ku çawa dikare mijara xwe balkêştir bike.

» Berî ku podcastçêker li ser mijarekê podcastekê amade bike divê jixwe bipirse ka guhdar çima bixwaze guhdariya vê mijarê bike.

» Gelo ev podcast wê feydeyeke çawa bide jîyana guhdêran.

» Guhdar li ku û çawa guhdariya we dikin; li malê, li derve, di trênê de, dema diçe kar?

» Podcastçêker piştî weşanê dixwaze li ser guhdaran bandoreke çawa çêke, li ser wê mijarê dixwaze çi bi wan bide hîskirin an çi bide hînkirin?

» Beriya her tiştî guhdar dê weşana te bi kê re û bi çi armancî parve bike?

» Yanî beriya ku we mijarek an armancek da pêş xwe divê hûn li ser van pirsan bisekinin, bersivên van li ber dilê xwe, di mêjiyê xwe de zelal bikin eger kes bi saetan guh nade we.

## ÇI TEKNÎK DIVÊ?

Ger bersiv û amadekarî temam bûn, mijar û mêvan jî dîyar û zelal bûn, kerem bikin em dest pê bikin:

Berê ji bo amadekirina raportekê recordek divîya. Lê niha di pergala amûrên amadekirina podcastan de raportên dengî li ser telefonekê jî tomar dibe, lewma hûn dikarn bi mikrofonekê jî li ser mijarekê raporta dengî amad bikin.

Podcast li ser Apple İTunes, Apple Podcast, Spotify ne.( 700 hezar podcast hene li ser van mecarayan)

*Ez ji bo weşanên radyoyan raportên dengî amade dikim û paşê ew raport weke podcastan li ser malperê tên belavkirin da ku guhdar bikaribin wan tomar bikin.*

Lê ku hûn bixwazin bi serê xwe tiştekê amade bikin ji bo malperan çawa ku malper hostîngê divê, ji bo podcastan jî domaîn pere divê.

» Piştî ku we mijar diyar kir navekê li bernameya xwe bikin da ku ji nav hezaran podcestan navê podcasta we di bîr de bimîne.

» Podcast divê di nav 20-45 deqeyan de be. Lê ya îdeal 30 deqe ye da ku guhdar aciz nebe.

» Ger weşana te hefteyê carekê be, di hefteya duyemîn de jî divê di heman rojê û heman saetê de biweşînî da ku di hiş de bimîne.

» Hûn dikarin ji bo sezoneke di navbera 6-12 beşan de li ser mijarekê weşanê bikin. Heta hûn dikarin di sezona 2-3an de jî lo ser heman mijarê dewam bikin.

» We mijar dîyar kir, recorder û mikrofon peyda kir, li ser mijarê we hevepyvîna xwe kir, teksta xwe amade kir, senaryoya xwe jî çêkir, îca hûn dikarin dest bi xwendinê bikin.

» Ji bo wê jî divê dengê we ji dil û can, germ , rast û divê xwendina we di cî de be. Hewce ye hevokên we zelal û herikbar bin . Divê hûn bikaribin bi denge û teksta xwe dîmenan ava bikin.

Piştî we xwendina deng jî temam kir îcar dor tê li ser montajê.

» Ku Audicity ji bo mac PC dikarin bê pere daxînin û hemî dengan li gorî kompozisyona xwe montaj bikin.***(nehat fêmkirin)

» Adobe Audition, Cool Edit Pro jî hene lê ew bi pere ne. Ji bo profesyonelan jî Protools heye.

Pişti we her tişt temam kir, divê hûn a weşana xwe li ser malpera xwe host bikin û linka RSS çêkin an jî podcasta xwe li ser hostingên podcastê bicî bikin. Ji bo wê jî divê podcasta xwe li ser servisên medyayê qeyd bikin, paşê jî lînka RSS li ser servîsê wek İtunes, Spotify, Stitcher, Google Podcast, Pandora podcastê qeyd bikin.

## BEŞÊN KURDÎ YÊN RADYOYÊN NAVNETEWÎ

**1) VOA Kurdish - Amerika**
Malper: https://www.dengeamerika.com/
Face: https://www.facebook.com/pg/voakurdi/

**2) WDR - Cosmo KOLN RADYO – Almanya**
Malper: https://www1.wdr.de/radio/cosmo/programm/sendungen/bernama-kurdi/livestream-bernama-kurdi-100.html
Face: https://www.facebook.com/bernamakurdi/

**3) SBS –Avusturalya**
Malper: https://www.sbs.com.au/language/kurdish/podcast/sbs-kurdi
Face: https://www.facebook.com/SBSKurdish/

## PIRS

**Hewce ye ku podcastek çend deqîqe be?**

Maweya podcasta te li gorî mijara te reng digire. Heke podcasta te li ser mijareke dirêj be û tu bixwazî çend alavên wekî mûzîk û tiştên din lê zede bikî wê çaxê maweya podcasta te jî dirêj dibe.



# NIVÎSÎNA NÛÇEYÊN JI BO MEDYAYA DÎJÎTAL

**OMER FARUK BARAN***
VOA

*Omer Faruk Baran li Sirûcê hatiye dinê. Li Zanîngeha Teknîk ya Stenbolê, li Zanîngeha Stenbolê û li Zanîngeha Dîcle, endezyarî, sosyolojî û hiqûq xwendiye, lê her sê zanîngeh jî bi seri nekirine. Bi şiîra bi navê ”Bîrêmjar” di sala 2011an de, bi çîroka bi navê ”Zênebêj” di sala 2012an de xelat wergirtiye. Baran di Rûdawê de bi nûçeyên edebîyat û hunerê dest bi rojnamegeriyê kiriye û piştre bûye nûçegihanê Sputnikê. Ew ji 2017an vir ve di Dengê Amerîka de edîtor e. Wî fanzîneke fotografîyê ya bi navê ”flashhilat” derxistiye, kitêbeke wî ya şiîran heye û bi navê ”Şeveke Îstismar” romankek jî nivîsîye.



Înternet bi ceribandinên Wezareta Berevanî ya Amerîkayê (Pentagon) di salên 1960î de çêbû. Armanca ceribandinên wê wezaretê çêkirina toreke komputeran bû ku ew di rewşên awarte de, di demên cengê de ragihandinê hêsan bike.

Di sala 1995an de ku li Amerîkayê The Washington Times û The New York Timesê dest bi weşana li ser înternetê kirin, bo cîhanê di ragihandinê de qonaxeke nû ya dîjîtal dest pê kir û ew roj bi roj bi pêş ve çû.

Rojnameya Lloyd’s List ya ku bi qasî 300 salan li ser behrvanîyê weşan kiriye di sala 2013an ragihandibû ku ewê derbazî weşana dîjîtal be. Edîtorê Lloyd’s Listê Richard Meadeyî  gotibû ku bi tenê 25 aboneyên wan yên rojnameya matbu mane û dîyar kiribû ku ji ber ku weşana dîjîtal rê û derfetên nû dide bo ragihandinê piranîya xwendevanên wan weşana dîjîtal dixwazin.

Îro ro di vê dewra rojnamagerîyê dijîtal de çi kesên telefonên wan yên bi kamera û înternetên wan hebin dikarin bibin rojnamager. Çinku rojnamagerî ragihandin e, û bi taybetî piştî Şerê Îraqê yê di sala 2003an de destpê kiriye, bi vîdeoyên welatîyên ji rêzê ji ajansan re şandine ‘’rojnamegeriya welatîyan’’ çêbûye.

Çi ‘’welatî’’ çi ‘’ne-welatî’’ hemî rojnameger divê li gor hin pîvanên nûçegihanîyê tevbigerin. Gava nûçeyek bi tenê li ser ‘’îdia’’yan were amadekirin, ferz e ku rojnameger bi hevokên xwe nîşan bide ku ew bi tenê ‘’îdia’’ ne û hîn nehatine piştrastkirin. Ji ber herbên di navbera hêzên kurdan û dewleta Tirkîyeyê de, bi taybetî kurdên li Tirkîyeyê dijîn çi bi kurmancî çi bi tirkî ji bultenên nûçeyan pirtir hevokên propagandatîf bihîstine ku ew dûrî pîvan û prensîbên rojnamegerîyê ne.



Di Mijdara 2016an de li Baxlara Dîyarbekirê bi maşîneyeke bombebarkirî peqînek çêbûbû. Walîtîya Dîyarbekirê ser peqînê Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) tawanbar kiribû. Berê Dewleta Îslamî ya Şam û Îraqê (DAIŞ) dûv re jî Teyrebazên Azadîya Kurdistanê (TAK) berpirsîya peqînê girtibûn ser xwe. Rojnameger, di bûyerên wisa de bêyî ku berdevkên alîyekî bin divê îdiayên hemî alîyan ragihînin. Hele ku di vê dewra dîjîtal de nabe ku daxuyanîya hin alîyan neyê dîtin û paşguh kirin û nûçe bi tenê li gor daxwazên dewlet û rêxistinekê werin çêkirin. Karê rojnamageran ne rizgarkirina welêt e, ragihandin e.

Bi pêşketina rojnamgerîya dîjîtal re bikaranîna datayên zanîngeh, sazîyên sîvîl û kompanîyên lêkolînan jî êdî bûye yek ji beşên girîng ên rojnamegerîyê. Bi nûçeyên li ser datayan hatine amade kirin meriv dikare li ser bûyeran bibe xwedan fikir. Îro ro di rojeva me de vîrusa koronayê heye û hejmara pêketîyên wê vîrusê, mirinên ji wê jî nûçe ne. Di nûçeyên bi data de ferz e ku rojnamevan çavkanîya datayan jî di nûçeya xwe de bêje. Eger em agahîyên ser pêketin û mirinên ji vîrusa koronayê ji Zanîngeha Johns Hopkinsê digirin, divê em navê wê zanîngehê di nûçeya xwe de hildin.



# AJANSÊN NÛÇEYAN Û NÛÇEGIHANIYA AJANSAN

**RÊDÛR DÎJLE***
MA

*Rêdûr Dîjle li gundê Dêrîşê Stewra Mêrdînê ji dayik bûye. Li Bismila Amedê mezin bûye. Ji dibistana seretayî heya lîseyê, li Bismilê xwendiye. Li Zanîngeha Dîcleyê Beşa Áboriyê xelas kiriye. Bi navê»Eşefa Temeneki» û «Kesek» du pirtûkên wî yên helbesta çap bûne. Ji xeynî vê karê wergerê dike. Nêzî 6 sal in rojnamevaniyê dike. Li Ajansa Nûçeyan a Dîcle (DÎHA) û dihaberê xebitîye û niha jî li Ajansa Nûçeyan a Mezopotamyayê (MA) dixebite.



Ji serdema ewil bigire heya niha zanyarî, agahî û malûmat ji bo mirovan eynî wekî nan û avê bivê nevê ye. Mirovan her tim meraq kiriye. Dane dû vê meraq û tatêla xwe. Xwestine geşedan û qewimînên li derdorê diqewimin hîn bibin. Xwestine li gor van qewimînan pozisyona xwe diyar bikin û tevbigerin. Lewra mirov bi rihetî dikare bibêje ku dîroka ragihandinê ji roja ku wate li jiyanê hatiye barkirin, ji roja ku mirovan wateyek li xwezayê bar kiriye, pêwendî bi xwezayê re daniye û bi xwezayê re ketine nava danûstendinekê dest pê kiriye. Bi awayekî dîtir, dîroka ragihandinê bûyer û diyardeyeke bi qasî dîroka mirovahiyê kevn e. Yanî di her çaxî de qîmet dane ragihandinê. Wekî pêdiviyeke jiyanî ya sereke esas girtine. Ji ber vê pêdiviyê lewma her çûye di warê amûr û alavên ragihandinê de jî qewimîn û pêşketinên mezin çêbûne û hîn jî çêdibin; êgir, resmên li ser dîwarên şikeftan, kew, peyk, telgiraf, telefon, radyo, televizyon, rojname, ajansên nûçeyan heya bi medyaya sosyal…

Qewimînên di warê ragihandinê de yên merhale bi merhale pêş ketine û dikevin, tu bikî nekî bandorê li kodên sebrê û tamûlkirinê yên mirovan jî dikin. Lewra mirov êdî tamûl û sebr nakin ku bûyerên diqewimin “sibê” an “dusibe” an jî çend saet şûnde hîn bibin, dixwazin kêlî bi kêlî hay ji wan çêbibin. Lewma di vê cîhana global de bi qasî pêşketina alav û amûrên ragihandinê, dem û awayê ragihandina nûçeyan jî girîng e. Çendî ku rojname, televizyon û radyo sûdê ji van geşedanên teknolojiyê bigirin jî lê belê, ji ber ku derfet û îmkanên wan tune ne xwe bigihînin hemû qewimîn û malûmatan, serî li sazî û dezgehên din ên ragihandinê didin. Ev sazî û dezgeh jî çavkaniyên nûçewergirtinê ne. Yanî ajansên nûçeyan e ku awayê wan ê xebatê ji yê rojname, televizyon û radyoyan hinekî cudatir e.

## AJANSA NÛÇEYAN

Cîhana em lê ne, cîhaneke global e. Ev globalbûyîn jî her diçe zêdetir dibe. Bi vê re her diçe teknolojî qewîtir dibe. Bi pêşketina teknolojiyê re navgînên ragihandinê jî pêş dikevin. Ev pêşketin di warê dem, awayê ragihandinê hwd. de girîngîyeke din li ragihandina nûçeyan bar dike. Di vir de girîngiya ajansên nûçeyan bêtir derdikeve pêş. Ji lewra îro tu saziyeke ragihandinê nikare hemû qewimînên li seranserê cîhanê diqewimin bişopîne û nûçegihanên xwe bişîne her derî. Îjar ji bo ji ragihandina van qewimînan bêpar nemînin, serî li ajansên nûçeyan didin ku ev sazî û dezgeh li gor sazî û dezgehên din ên ragihandinê xwedî rêxistinbûyîneke cihê ne.

Ajansên nûçeyan ên di warê belavkirin û ragihandina nûçeyan de xwedî rol û risteke girîng in û îro roj her diçe hejmara wan zêde dibe, ewilî gava dest bi kar û barê xwe kirine tenê bi awayekî nivîskî nûçe çêkirine. Lê belê îro roj bi pêşketina teknolojiyê re nûçeyên xwe bi wêne, dîmen, grafîk û kategoriyên nûçeyan qewîtir dikin û bi formateke nû serwîs dikin.

## PÊNASEYA AJANSA NÛÇEYAN

Heya niha derbarê ajansên nûçeyan de gelek pênase hatine kirin. Yanî mirov nikare behsa pênaseyeke mutabiq bike. Lê belê ji bo meriv karibe ajansên nûçeyan pênase bike, a baş mirov li armanc û hedefên wan binêre û li gor van armanc û hedefan pênaseyekê deyne. Lewra bi pêşketina teknolojiyê re û nexasim jî piştî medyaya sosyal bû perçeyek ji jiyana mirovî, pênaseyên heyî hinekî berteng mane. Nivîskarê amerîkî John Hohenberg ku ji bo ajansên nûçeyan dibêje

“nûçegihanên anonim ên serdema me” pênaseyeke bi vî rengî dike: “Ajansa nûçeyan saziyeke ku ji borojname, radyo, televîyon, kovar û navgînên girseyî yên ragihandinê nûçeyan peyda dike.”C. F. Başkut bi vî awayî pênase dike: “Ajans, ew sazî ye ku nûçeyên xwe bi awayekî objektîf berhev dike û bi şertê ku ji rastiya wê bawer e bi awayekî herî zû digihîne rojnameyan.” A. R. Bulbul bi vî awayî pênase dike: “Ajansa nûçeyan, li ser asasê bêalîbûn, rastî lezgîniyê bi rê û rêbazên cuda agahiyên bi dest xistine radigihîne aboneyên xwe.” Bi kurt û kurmancî gelek kes pênaseyek bi vî rengî dike: “Hildiberîne, saz dike û dide ber bazariyê, serwîs dike.” Dîrokçeya Ajansên Nûçeyan û Girîngiya Ajansan Bi awayekî fermî dîroka ajansên nûçeyan di nîveka ewil a sedsala 19’an de dest pê kiriye. Pêşengê vê jî Charles Havas e. Havas, bi eslê xwe macar e, lê welatiyê Fransayê ye. Havas di sala 835’an de bi navê Agence Havas ajanseke nûçeyê ava kiriye. Gava Havas ajansa xwe ava dike, rojname xwe pir nadin ber nûçeyên wî û jê nastînin.

Ên ku ewil nûçeyên Havasê stendine diplomat û banker in. Lê belê piştî vê pêngava Havasî, her çû ajans li ser ajansan vebûn û îro roj tenê ne çapemeniya matbû, çapemeniya devkî û dîtbarî jî ji bo nûçeyên çi herêmî çi navneteweyî hema bibêje weşana xwe gişî li ser asasên nûçeyên ajansan dikin û sûdê ji wan digirin. Hele piştî guherîn û veguherîna di qada dîjîtal û pêşektina medyaya sosyal de girîngiya ajansên nûçeyan bûye tiştekî bivênevê. Lewra îro ro medyaya sosyal bûye perçeyek ji jiyana mirovan, çi baş çi xirab. Tiştên diqewimin, piranî jê berîya televizyon, radyo, rojname û heta beriya ajansên nûçeyan li ser medyaya sosyal belav dibin. Lê ji ber ku ev qad jî hêdî hêdî dejenere dibe û dibe qadeke girifît, fikar li mirovan peyda dibin; gelo tişta hatiye parvekirin rast e yan na? Di vir de ji televizyon, radyo û rojnameyan pirtir bar dikeve ser milê ajansên nûçeyan û vê carê çavê her kesî li ajansên nûçeyan digere; gelo bê ka derbarê vê qewimînê de tiştek heye yan na? Yanî ajansên nûçeyan di warê teyitkirin û piştrastkirina ew qewimîn û malûmatên li medyaya civakiyî belav dibin, qadeke bivênevê ye. Lewra ajansên nûçeyan ên li ser asasê bêalîbûn û rastiyê wê qewimîn û zanyariyê dadiwerivîne û bi çavkaniyên ewle, bi delîl û belgeyan piştrast dike û bi aboneyên xwe, bi raya giştî re parve dike.

## NÛÇEGIHANÊ/A AJANSÊ Û TAYBETMENDIYÊN NÛÇEGIHANAN

Nûçegihanê/a ajansa nûçeyan, berî her tiştî xwedî ajanda ye. Peywira wî/ê ya sereke ew e ku nûçeyan berhev bike û binivîse. Wekî nûçegihanên sazî û dezgehên din ên ragihandinê divê li ser asasên rastî, bêalîbûn, obejktîfî û lezbûyînê tevbigere. Nûçegihanê/a ajansê qewimînên rutîn dişopîne. Li gor rojeva ku ajans dide ber wî/ê lêkolînan dike. Ji bo nûçeyên taybet pêşniyarên xwe dide ber ajansê û li gor formata ku ajans esas digire nûçeyên xwe bi zimanekî sade dinivîse.

» Nûçegihanê/a ajansê her tim rojeva welêt û cîhanê dişopîne,

» Her roj rojeva sibê amade dike

» Di warê demê de jîr e, çavvekirî ye

» Xwedîmeraq e, çavdêrekî çak e

» Jêhatî û şopîner e

» Bi şik û guman e,

» Xwedî qabîliyeta dahurandin û analîzê ye

» Li benda nûçeyê nasekine, dide dû nûçeyê

Çendî ku pîvanên rojnamevanan nêzî hev bin jî, lê belê yên nûçegihanê/a ajansê ji yên heyî hinekî cudatir e:

» Di warê demê de, ji yên din cudatir e.Lewra sazîya ku lê dixebite 24 saetan bênavber nûçeyan parve dike. Ji ber vê di nûçegihanên ajansan de têgiha demê cuda ye.

» Di warê nivîsandina nûçeyê û formata nûçeyê de, nûçeya xwe li gor formata ajansa xwe dinivîse. Awayê nivîsandina nûçeya nûçegihanê/a ajansê li gor ên rojname, televizyon û radyoyan cuda ye. Nûçeya xwe li gor girîngiyê paragraf bi paragraf bi rêz dike.

» Di warê pîvanên nûçegihanîyê de, pîvanên sereke yên ajansan rastî, bêalîbûnî, objektîfî û lezgînî ye. Nûçegihanê/a ajansan jî divê li gor van pîvanan tevbigere. Divê şiroveyê daxilî nav nûçeyên xwe neke. Heger şirove hewce be jî divê şîroveyê û nûçeyê ji hev bike û vê yekê bi sernavekî yan jî binbeşek cuda diyar bike. Ji ber ku aboneyên ajansan xwedî polîtîkayên cuda ne, nûçeyên ji aboneyan re tên şandin jî divê li ser asasên rastî, bêalîbûnê bin û bi lez bên şandin.

» Di warê alavan de jî nûçegihan divê nûçeyên xwe bi wêne û dîmenan xurt bike.

## NÛÇEYEKE BÊQISÛR

» Sernav û destpêk divê li hev bikin

» Pirsên 3Ç 3K gere hatibin bersivandin

» Hevok divê kurt bin, ziman xwerû be

» Bilêvkirin û wate divê yekpare bin

» Divê şaşiyên mantiqî tune bin

» Pîvanên rastnivîsandinê divê esas bên girtin

» Bi awayekî objektîf divê bê nivîsandin

## BERÎ KU NÛÇE BÊ SERWÎSKIRIN ÇEND TIŞTÊN DIVÊ BÊN KIRIN

Nûçegihan, berî ku nûçeya xwe serwîs bike miheqeq divê carekê nûçeyên xwe sehî bike û piştî vê sehîkirina dawî divê nûçeyê serwîs bike. Ji bo vê dikare alîkariyê ji hevalên xwe bixwaze. Berî nûçe bê serwîskirin çend tiştên divê bên kirin:

» Gelo sernav û naverok li hev dikin?

» Pirsên 3Ç 3K hatine bersivandin?

» Mijara nûçeyê baş hatiye bilêvkirin?

» Nav û unvan li seranserê nûçeyê rast hatine nivîsandin?

» Hejmar, miqdar, dîrok rast in yan na?

» Gotin û peyvên zêde ji nûçeyê hatine derxistin?

Nûçegihanê/a ajansê wekî morîyan e, sekin lê tune ye. Tim dixebite. Lewma li ku derê dibe bila be, li wê derê dest, pê, çav û guhê ajansa xwe ye. Lê divê ji bîr neke, çendî ku ya wî ji nûçegihanên din cihê dike lezgînî û destsivikiya wî be jî, lê divê têgeha rastiyê tu carî neke qurbana lezgîniyê.



# ROJNAMEGERÎYA JINÊN KURD

**SAFÎYE ALAGAŞ***
JINNEWS

*Safîye Alagaşê di sala 2008'an de li Ajansa Nûçeyan a Dîcleyê (DÎHA) dest bi stajyertiyê kiriye. Heta sala 2012'an de li DÎHA'yê xebitiye. Piştî wê ji ber xebatên rojnamergertiyê doz lê hatiye vekirin û ji ber van sedeman 3 salan navber daye rojnamegerîyê. Di sala 2015an de li Şaredariya Peyasê ya Amedê di qada çapemeniyê de xebitîye. 2017an de bi hatina qeyyum ji kar hatiye derxistin. Di Rojnameya Şujinê de xebitiye. Lê dîsa rojnameya Şujin jî bi biryara KHKê hatiye girtin. Piştî van ew jî di avakirina Ajansa JİNNEWSê de cî digre. 4 sal in di JINNEWS'ê berpirsiyar û midura karên nivîsê dimeşîne. Di heman demê de nûçegihanîyê dike. Ji ber têkoşîna wê ya rojnamegerîyê, di sala 2019'an de li Îtalyayê 15mîn xelata rojnamegerîya navneteweyî ya Marîa Grazia Cutulî girtiye.



Herî dawî Rojnameya Jiyana Nû (Yeni Yaşam) di 1ê çiriya paşîn de dest bi çapa pêveka jinê kir. Li gel vê dema em li paşxaneya rojnamegeriya jinên kurd dinêrin em dibînin ku Jin News û Jin TV di qada Rojnamegeriya Jinan de bi awayekî aktîf rol girtine û dest bi serdema weşanê kirine.

Jinên kurd di qada rojnamegeriyê de ev demeke dirêj e têdikoşin. Li gel ku her tim rastî qetlîam û qedexekirinê hatin, jin di çapemeniya kurdî de bi awayekî têkoşîna xwe mezin kirin. Nexasim ev sedeya çaryekî de bi keda rojnamegerên jin çapemenîya kurdî xwe gihand astekî girîng.

Ji kovaran heta rojnameyê, ji ajansa jinê heta televîzyona jinê, di her qadê de bi roleke girîng medyaya xwe ava kir.

Serpêhatiya rojnamegeriya jinên kurd bi Rojnameya Kurdistanê ya ku di 22yê nîsana 1898an de li mişextîyê derketibû dest pê kir. Digel hemû zext û zordariîyan bi bedelên mezin bi mezinkirina wesf û nirxa xwe, xwe gihand heta roja me ya îro.

## TECRÛBEYA YEKEM A KOVARA JINÊ

Di qada dîroka çapemenîya giştî de rojnameya Kurdistanê wek destpêk tê zanîn lê Kovara Jînê ya ku di sala 1918an de hatîye weşandin ji bo rojnamegerên jin wek mîladê tê qebûlkirin. Digel vê wateya xwe kovara Jînê di dîrokê de gelek kêm cih digire. Em serpêhatiya jinên kurd a li ser medyayê bi Kovara Jînê ya ku navgîna weşana Cemiyeta Jinê ya Tealiya Kurd e dikarin bidin nasîn.

Di nav Cemîyeta Jinê ya Tealiya Kurd de ji bo avakirina hizra têgihîştineke netewî di jinan de çêbike arîstokratên Kurd cih digirtin. Kovar li ser têgihiştina Kurdayetî û wekheviyê bi 2 hejmaran weşiya.


Piştî 2 hejmaran weşanê dom nekir û sedema rawestana weşanê jî mixabin nehat zanîn. Bi vê yekê re têkildar sedema rawestana weşanê bi girtina Cemiyeta Tealiya Jinên Kurd re tên girêdan. Lê digel van jî agahiyek zelal di derbarê girtina Cemiyetê de tune ne.

## CÎHANA JINAN

Li vir mijara girîng a din jî Kovara Cîhana Jinan a ku di nav Împaratorîya Osmanîyê de bi hemû hêmayên etnîk derxistina kovarê ya bi hevparîya jinan e. Li navenda polîtîkaya weşana kovarê nirxandina pirsgirêkên jinan ên bêyî cudahîya zimanî, dînî û mezhebî were kirin heye. Vê tişt jî rê li ber nivîsandina jinên kurd ji bo vê kovarê vekir. Kovarê di sala 1913an de dest bi weşanê kir û heta sala 1921an jî weşana kovarê dewam kir. Damezirîner û nivîskarên kovarê ji kovara Jinê ya ku 2 hejmarên wê hatin weşandin, Meziyet Bedirxan, Fexriye Bedirxan, Mes'adet Bedirxan û Fato Nalînê cih digirtin.

## DIVÊ BÊ LÊKOLÎNKIRIN

Di salên 1932-1950î de jinan di çapemeniya kurdî de wekî nivîskar û rêvebir cih girtin. Navên van jinan di nav civakê de gelek kêm tên zanîn. Her wiha di der barê fealiyetên wan ên rojnamegeriyê de jî zêde agahî nayên zanîn. Jiyanên wan jinên ku ji bo rojnamegeriya jinên kurd mîrateyeke mezin hiştine  li benda danasînê ne. Divê cihê rojnamegeriya jinên kurd di dîrokê de berbiçav be. Bo nimûne Rewşen Bedirxanê li gel berpirsîyarîya Midurîyeta Karên Nivîsê ya li Hawarê, qunciknûsî jî kirîye.



Keça Pîremêrd Rahmexanê jî piştî mirina bavê xwe di sala 1950î de berpirsîyarîya îmtîyaza Kovara Jînê girt û xebatên xwe kirin.

Dema bi giştî were nirxandin di navbera salên 1950-2018an de li her çar parçeyên Kurdistan û dîasporayê 1074 kovar, rojname, ajans û sîteyên înternetê yên jinan derketin. Dibe ev hejmar zêdetir be jî. Ji ber ku hîn gelek hilberînên jinan hene ku li bin mêtingeriyê ne û hê jî derneketine holê.

Heke em bi rêjeyî lêbikolin; jinên kurd di salên 1950î de 3 weşan, di salên 1970î de weşanek, di salên 1980î de 6 weşan, di salên 1990-1999an de 47 weşan, di salên 2000-2009an de 38 weşan, di salên 2010-2020î de 24 weşan weşandine. Di navbera salên 1950-1990î de lawazbûna têkoşîna netewî ya kurdan bandor li ser rojnamegeriya jinê kiriye. Gelek kêm be jî weşanên ku niha hatine derxistin hişmendîya netewî ya kurdan derdixe pêş. Piştî salên 1990î li her 4 parçeyên Kurdistanê

hişmendîya netewî di qada rojnamegeriyê de xwe derdixe pêş. Dema em lê dinêrin piştî salên 1990î di qada rojnamegerîyê de berzbûnek tê dîtin. Piştî salên 2000î tê dîtin weşangerîya jinan bi awayekî birêkûpêk tê meşandin. Weşangerîya belavbûyî berê xwe dide têkoşîneke pirdengî û rêxistinê.

## DI SALA 1990Î DE LI EWRÛPAYÊ JINA SERBILIND

Ji destpêka salên 1990î bi girsebûyîna têkoşîna kurdan re geşedana çapemeniya jinan bingeheke xurt ava kir. Li Başûrê Kurdistanê “Jiyana Azad” di 8ê adara 1997an de li Silêmaniyê bi awayekî rojnameya heftane dest bi weşana xwe kir. Di sala 1999an de rojname mecbûr dimîne weşana xwe bide

rawestan, di sala 2000î de bi navê Roşnayî dîsa li weşana xwe dewam kir. Rojname di sala 2004an de bi navê Trûskayê derket. Li Tirkiyeyê jî di sala 1998an de kovara “Jina Azad” dest bi weşanê kir. Vê kovarê paşê bi navê “Dengê Jinê” û “Dengê Jina Azad” weşana xwe domand.

Li Ewrûpayê jî Kovara Newaya Jin di 4ê nîsana 2000î de bi armanca ku bibe dengê hemû jinan ji aliyê jinên kurd ve dest bi weşana xwe kir. Li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê jî di sala 2007an de bi esas girtina vegotina pirsgirêkên îdeolojîk, siyasî, çandî û civakî kovara Hêviya Jinê dest bi serdema weşana xwe kir.

Li Tirkîyeyê jina yekem a derhênera weşana giştî Gurbetelli Ersöz e. Gurbetelli Ersöz yek ji wan jinan e ku me di qada rojnamegerîyê de herî zêde jê hêz gîrtîye. Em her dem di hêz û wêrekîya xwe de wê mînak digirin. Wê ji bo rojnamegerîya jinên kurd mîrateyeke mezin hiştîye. Wê di navbera paşxaneya dîrokî ya jinên kurd û serdema niha ku tê de dijî girêdanek çêkir û li ser vê esasê rojnamegeriya xwe ava kir. Bi kiryarên xwe her tim rojnamegereke binirx bû.

Li Tirkiyeyê derhênera jin a yekem a weşana giştî Gurbetelli Ersoz di 7ê cotmeha sala 1997an de jiyana xwe ji dest da. Rojnamegerên jin ên kurd di sala 2013an de roja wefata Gurbetelli Ersozê ya ku 7ê cotmehê de jiyana xwe ji dest dabû “Roja Rojnamegerên Jinên Kurd” îlan kirin.

Gurbetelliyê di serî de ji bo çapemeniya azad, li Tirkiyeyê jî ji bo nûçe çêkirina jinan rengeke nû anî.

Gurbetelliyê li Zanîngeha Çûkûrovayê li Fakulteya Fen-Edebiyatê beşa kîmyayê temam kiriye. Piştî perwerdeya lîsansê li Enstîtuya Zanistên Fenê li ser mijara ‘Enerjî û Hawirdor’ê lîsansa bilind kiriye.

Digel van di beşa kîmyayê de weke erkdara lêkolîner xebitîye. Gurbetelli Ersöz di dema salên zanîngehê de bi siyasetê re eleqedar dibe û di sala 1989an de ji ber fikrên wê yên siyasî tê darizandin.

Gurbetelli  15 rojan di bin çav de dimîne û rastî îşkenceyên giran tê. Piştî wê tê girtin û wê dişînin Girtîgeha Meletîyê. Li girtîgehê 2 salan girtî dimîne.

Piştî ku di sala 1993an de hat tahlîyekirin, li Rojnameya Ozgur Gundem’ê de wekî gerînendeya weşana giştî  cih digire. Ligel vê yekê bû yekem gerînendeya giştî ya li Tirkiyê. Gurbetelli vê tabetmendiyê wiha pênase dike: “Helbet, gerîndeya weşana giştî ya ku jinek kurd dike gelek girîng e.

Di demên dawîn de jinên kurd li gorî mêran gelek pêş ve çûne. Îro asta ku ez tê de cih digirim bi vê têkoşînê ve girêdayî ye.”

Di vê navberê de jî zext û êrîşên li ser Rojnameya Ozgur Gundemê her ku diçû xwe zêdetir dikirin. Nûçegihan û belavkarên wan dihatin girtin û qetilkirin. Di 10ê berfanbara sala 1993an de, ji aliyê bi sedan polîsan avahîya rojnameyê hat desteserkirin. Ligel xebatkarên rojnameyê Gurbetelli dîsa hate binçavkirin. Di 13 rojên ku di bin çavan de ma, rastî îşkence û muameleyeke nebaş hat. Piştî vê hat girtin û şandin girtîgeha Sağmalcılar’ê. Danîşîna wê ya yekem a di meha pûşbera 1994an de hat dîtin û hat tahliyekirin. Ji ber asta zextên li ser, di sala 1995an de tev li PKKê bû. Di 7ê cotmeha sala 1997an de di encama pevçûnekê de jiyana xwe ji dest da.

## LIGEL XEYALA AYFER SERÇEYÊ, JINHAYÊ DEST BI NIVÎSANDINÊ KIR

Li dijî zimanê nûçeyên  zayendperest ku bibe wek alternatîfekê ji bo jinên kurd ên rojnameger, ajansa jinan hat ava kirin. JINHA wekî ajansa jinê ya yekem a herêmî û  li tirkiyeyê di 8ê adara 2012an de hat vekirin.  Xeyala herî mezin a Ayfer Serçeyê ya ku di sala 2006an de ji aliyê rejîma Îranê hat qetilkirin, avakirina ajansa jinan bû. Ayfer Serçe di jiyana xwe ya rojnamegerîyê de çûye gelek deveran, herî dawî ji bo ku kuştina jinên Îranê lêkolîn bike diçe rojhilatê. Lê Ayfer li wir bi komploya rejîma Îranê hat qetilkirin. Li gorî çavkaniyên Rêxistina Rojnamegerên Sînornenas(RSF) Ayferê di 23ê tîrmeha sala 2006an de  jiyana xwe ji dest daye. Lê belê li gorî çavkanîyên din Ayferê di 19ê tîrmehê de jiyana xwe



ji dest daye. JINHA, ji midûra nûçeyan heya edîtor û nûçegihanân ve ji jinan pêk tê. JINHAyê armanc dikir ku nûçeyan bi nerîna jinê bigihîne seranserê cîhanê.

JINHA, bi dirûşmeya 'Bêyî ku em bibêjin mêr çi difikirin, em dinivîsin.'ê ket rê û bêguman diavakirina xwe de di çarçoveya azadiya jinên kurd de hat pêşxistin. JINHA, di 29ê cotmehê sala 2016an de bi biryarnameya di hukmê qanûnê de hate girtin û deriyê ajansê hat mohrkirin. Lê piştre di 5ê kanûna sala 2016an de rojnameya înternetê ya jinê Şûjinê dest bi weşanê kir. Şûjin bi dirûşma "Di zimanê medyayê de, bi niyeta şûjin e***." dest bi xebatên xwe kir. Lê di 25ê tebaxê sala 2017an de bi KHKyê hat girtin. Bi heman mîras û heman zanebûnê di 25ê îlonê sala 2017an de bi dirûşma "Jin bi pênûsa xwe li pey heqîqetê ne' JinNews hat avakirin û ji cihê ku nîvco mabû de dîsa dom kirin.

JINHA bi avakirina xwe ve di aliyê camîaya çapemeniyê de gelek bale kişand. Sedema wê bal kişandinê ew bû ku hemû xebatkarên wê ji jinan pêk dihatin. Lê di sedema xwe ya essas de rêveberên ajansê jinên kurd bûn û wê çaxê atmosfera sîyasî hin nermtir bû. Lê bi guherandina atmosfera sîyasî bala li ser jinên kurd ên rojnameger jî qels bû.

Em wekî jinan li Tirkiyê di bin navê JINNEWSê rojnamegerîya xwe de berdewam dikin. Xebata me ne tenê ji bo kuştina jinan, tundiya li ser jinan û ne tenê di hêla nûçeyên tundîyê de ye.Em di heman demê de di qadên sîyaset, aborî, ekolojî, dîrok û perwerdehî de jî nûçeyan çêdikin. Em di nûçeyên ku çêdikin de beyana jinê esas digirin. Ji ber ku em dizanin ku di çapemeniyê de gotin û nerîna jinan zêde cih nagire. Di her qadên jiyanê de jinên ku xwe pêş dixin hene. Di her qadan de jinên ku diaxivin hene. Em li dijî nerîna zayendperest in û em gotina jinan dixin pêş û derdixin holê.

Em hêvî dikin ku dengê jinên ku li dijî tundî , tacîz û destdirêjîyê têkoşînan dikin derxînin. Lê ji bo me ne tenê tundiya li ser jinê, di heman demê de têkoşîna ku jin li dijî vê tundiyê dide jî girîng e. Bi salan ne ku jinek li dijî vê tundiyê dengek derxist jî em vê dengê derdixin pêşberê civatê. Ji ber ku jin ne lawaz in. Çiqas hişmendiya serdest a mêr wan dorpêç bike jî jin li dijî vê îtîrazên xwe tînin ziman û serî natewînin. Sekna jinê ya bihêz hem di dîmenên wan de hem jî di zimanê wan ên nûçeyên de diteyîsin.

Ligel van yekan em bi zexteke giran re rû bi rû ne. Malpera me heya niha 15 caran ji aliyê Saziya Têkiliyê û Teknolojiyên Zanistê (BTK) û dozgerên herêmî hat astengkirin. Nûçegihanên me hatin binçav kirin. Di qadê de faalîyetên me yên rojamegerîyê ji aliyê polîsan ve tên astengkirin. Lê belê em ê tevî van zext û astengîyan di kevneşopiya xwe ya rojnamegerên jin ên kurd de bi xebata xwe berdewam bikin.

Îro jî bi weşana xwe, zimanê zayendperest a di nav medyayê de diguherînin. Em bi bawer in ku di medyayê de zimanê serdest ê mêr dê teqez biguhere. Bi vê armancê em li ser rêya xwe ne û dê bimînin.

## PIRS

-Di çapemenîya Tirkan de behsa otobêsên cuda dikin. Gelo ew Jinha û Jinnews jî naşibe wê? Gelo modeleke din hebûya wê ne çêtir biba?

+Tişta ku di ji aliyê otobêsan ve rast e lê meseleya Jinhayê cuda ye. Di pirsgirêka otobêsê de pirsgirêk ne ez im, pirsgirêk civak e. Heke ew civak bê guhertin wê demê hewceyî Jinhayê jî nabe.

# NÛÇEGÎHANÎYA WÊNEYAN

**SERTAÇ KAYAR***
REUTERS

*Sertaç Kayar, sala 2006ê dest bi karê rojnamegerîyê kiriye. Ji bo REUTERSê wênegirîyê dike. Ji Yekîtîya Rojnamegeran a Başûrê Rojhilatî xelata “rojnamegerê salê” standiye. Xwediyê Xelata Rojnamegerîyê ya Metin Goktepeyî ye. Endamê Federasyona Rojnamegeran a Navneteweyî û Yekîtîya Rojnamegeran a Başûrê Rojhilatî ye.



Nûçegîhanîya wêneyan li ser esasa parvekirina rastîye derketîye holê û her ku roj diçe pêş dikeve. Ji ber vê pêşketinê ev kar roj bi roj berbelavtir, girîngtir û pêwisttir dibe. Heger çiqas zêdetir weke karekî teknîkî tê dîtin jî di bingeha vî karî de mijara herî girîng wêneyekî mayînde ye. Ji bo wêneyekî mayînde jî naverok û kompozisyon xalên girîng in. Wêne demeke dirêj di hişê mirovî de dimîne. Di buyerên ku li cîhanê diqewimin de herî zede kêlîya ku bi wêneyan tê nîşandan di hişê mirov de dimîne û her bûyer bi wêneyekî di hişê mirov de dimîne. Bo nimûne Hîroşîma, Helepçe û wêneyê Alan Kurdî jî yek ji wan e.

Naveroka nûçegîhanîya wêneyan dem, cîh û mirov in. Di wênayan de ev her sê tişt weke kompozîsyonekê derdikevin holê. Her welatek, bajarek, navçeyek, gundek, dem û mirovek xwedî taybetmendîyeke cuda ne. Ji ber wê divê nûçegîhanê wêneyan wan taybetmendîyan bizanibe û li gorî wê tevbigere. Ji ber wê lêkolîn jî girîng e. Her çawa nûçegîhan/wênegir hazirîya teknîkî dike, pêwist e ku amadekarîyeka lêkolînê jî bike. Hewce ye ku berî biçe qadê li ser bûyer, mijar, paşxane û pêşxaneya bûyerê jî lêkolînê bike û biçe. Ev yek dê karê wan dewlemendtir bike. Dema wiha nêzî mijarê bibe berîya ku biçe qadê dikare di serî de plansazîya wêneyê ku wê bigire di hişê xwe de bike. Divê gava ku diçe qadê jî hewl bide ku kompozisyona xwe bi nêrîneka cûda temam û xurttir bike.

Nûçegihanek/wênegirek berî ku biçe qadê divê hemû amadehîyên xwe yên teknîkî bike lewra karê tê kirin bêyî van amadehîyên teknîkî û amûran ne pêkan e ku bê kirin. Divê wênegir bikaribe bi kompozisyon, naverok, perspektîfeka cûda li bûyerê binêre, bibîne. Gava bikaribe wê pêk bîne wî wextî dikare berhemeka serkeftî derbixe holê. Û divê bizanibe kengî ji perspektîfeka teng, kengî ji perspektîfeka fireh li bûyerê binêre.

Serkeftîbûna wêne ji sedî sed ne girêdayî teknîk û amûrên ku tên bikaranîn e. Ji bo serkeftîbûna wêneyekî bikaranîna van pîvanan şaş e. Lewra tişta girîngiyê dide wêneyî ne qelîteya amûran e, dîmen û hestên di wêneyê de xwe didin nişandan. Ger wêneyek bikaribe bibe derbasbûna hestên di wêneyî de wê gavê ew wêne dikare wek wêneyekî serkeftî bê hesibandin. Yek wêne dikare bandora xwe li ser hemû cîhanê bike û di bîra mirovan de cî bigire. Gava wêneyekî ev yek pêk anî mirov dikare bibêje ev wêne jî wêneyekî serkeftî ye.

Bi pêşketina teknolojîyê êdi di medyaya dîjîtal de bi milyonan wêne tên parvekirin. Ji bo ku mirov di nava vê tevlîhevîye de winda nebe divê cudabûna xwe derbixe holê. Ev cudabûn jî bi nêrîneke têr û xurt û bi çaveke cuda pêk tê. Ji bo wêneyan her çav dewlemendîyek e. Divê haya mirovî ji vê dewlemendîyê hebe û nêrina xwe ya cuda bi wêneyan nişan bide.

Nûçegîhanên wêneyan divê mijarê ji hemû alîyan ve bigirin û li gorî rastîya mijarê tevbigerin. Ev yek berpirsîyarîyeke mezin e. Divê li gorî vê berpirsîyarîyê tevbigere û vê yekê bike bingeha karê xwe.



# MAFÊN BIKARHÊNER Û NÛÇEGIHANÊN MEDYAYA DÎJÎTAL

**ŞÎRAZ BARAN***
PARÊZER

*Şîraz Baran, sala 1990an de li Diyarbekrê ji dayik bûye. 2010an de dev ji beşa muhendîsî ya elektrîk-elektronîk a zaningeha Bilkentê berdaye û li Zanîngeha Dîcleyê dest bi beşa hiqûqê kiriye. 2015an de bûye parêzer. Weke fixer bi rojnameger û nivîskaran re dixebite.



## DÎROKA ÎNTERNETÊ

Di sere sala 1960î de peyama elektronîk a yekemîn li ser ARPANETê (şebekeya yekemîn) ji loboratuwara Leonard Kleinrockê (zanîngeha Kalîfornîyayê) di malpera Wayback Machineê de tê şandin. Ev peyam ji komputerekê ku li Israîlê ye re hatiye şandin.

Di 1990an de ARPANET û 95an de NSFNET emrê xwe temam dikin. Ji ber ku dawîya salên 80an de Tim Barners-Lee li Îngilistanê malpera yekemin a taybet ku bi dokuman û tekstên dewlemend dixebitin ava dike. World Wide Web (www) ji aliyê vî mirovî tê avakirin.  Ber bi salên 2000î ve astengên dijî înterneta taybet yek bi yek rabûn û peyamên têgihan, e-posta, blog, şebekeyên civakî û malperên danûstendinê bi pê hev dikevin.

## DÎRAKO MEDYAYA CIVAKÎ

Di sala 1971ê de e-maîla yekemîn tê şandin. Medyaya civakî jî pergaleke medyayê ye ku dihêle parvekirina agahdarîya yek-alî bi du-alî û bi hevdemî digel danasîna Web 2.0-ê ji karûbarê

bikarhêner re were peyda kirin. Diyalog û parvekirina di navbera komên piçûk de hêdî hêdî hilberîna naveroka bingeha bikarhêner zêde dike naveroka amator vediguherîne nirxeke li cîhana dîjîtal. Em dikarin dîroka medyaya civakî ji vê e-maîla yekemîn bidin destpêkirin. Lê piştî wê gelek zêde platformên medya civakî  hatine avakirin.  Li xwarê sal bi sal kîjan malpera medya civakî hatiya avakirin tê nivisandin.

- » 1971. e-maîla yekemîn
- » 199. Archie- Malpera lêgerînê a yekemîn
- » 1994. Malpera yekemîn a blogê
- » 1995. Classmates.com
- » 2000. Avakirina Wikipediayê
- » 2004. Facebook
- » 2005. Youtube
- » 2006. Twitter
- » 2007. Tumblr
- » 2010. İnstagram
- » 2011. Google Plus û Snapchat
- » 2012. Vine û Tinder
- » 2015. Periscope ve ScorP
- » 2016. TikTok

## MAFÊN DÎJÎTAL

Bi geşedanên di warê teknolojiyên agahdariyê de, cîhan piçûktir bûye, li şûna hemwelatiya welêt; Di forma hemwelatiya cîhana virtual de nasnameyeke supra ava bûye. Bi vê nasnameya jorîn, mirovan bêyî ku di cîhana nîgaşî de xwedan pirsgirêkên pasaport û nasnameyê bin, nemaze bi navgîniya torên civakî ve, azadiya rêwîtiyê û derbirînê digel hemû hêmanên xwe bi kar anîn. Di toreyên civakî de, mirov xwediyê her celeb bîr û ramanê ye; Ew dikarin deng, wêne, vîdyo, nivîs û zimanê înternetê, ku zimanê hevpar ê navneteweyî ye, parve bikin. Sînorên azadiya derbirînê yên ku li beramberî guhertina bilez û ji nişka ve ya platforma azadiyê ya ku di tevnên civakî de ji bo hemwelatiyên nêt ên ku ne xwediyê astengiyên ziman û nasnameyê ne hatine saz kirin, hîn jî bi zelalî nehatine diyar kirin. Ji ber ku nasnameya jorîn a ku li vir tê bikar anîn

têgîna hemwelatiya cîhanê ye û azadiyên ku têne bikaranîn têkiliyeke sedem û encamê li seranserê cîhanê diafirînin, pêdivî ye ku zimaneke hevpar, qanûna înternetê ya cîhanî pêş ve bike, ku pirsgirêkên li vê cîhana virtual bên çareserkirin. Ji bo ku hawirdora azadîya înternetê, ya ku mirovan digihîne rewşa hemwelatîbûna cîhanê, ku nasnameyeke herî bilind e, bi domdarî bi kêr bê, divê di înternetê de zagoneke hevbeş hebe ku hemî peywendîdar li ser wê li hev bikin.

Mafên dîjîtal, bi alîkarîya cîhazen elektronîk azadiya gihîştîna agahiyan, pekanînên naverokan û belavkirina van naverokan e li ser medyaya dîjîtal. Ji hevnasînê heta bazirganiyê, perwerdehî û rojnamevanî û reklam, ji ber ku înternet û bi taybetî medya civakî bi salan e di jiyana mirovan de bi giringî cîh digire, divê ji bo vê pergalê sîstemeke hiqûqê bê sazkirin. Li gor emrê qanûnên kuştinê û avakirina qanûnên esasî mafên dîjîtal xuya ye ku hê nû ne. Lê dîsa jî li hemû cîhanê û li Tirkîyê ji bo platformên dîjîtal li ser maf û berpisiyaryan qanûn tên nivîsandin.

Ji vana yekem, dikare bê gotin ji bo mafen dîjîtal qanûna bingehîn e, Deklarasyona Mafên Înternetê a Îtalyayê ye. ( Italian Declaration of Internet Rights). Li gor vê deklarasyonê mirov û sazîyen ku înternetê bi kar tînin xwediyên van mafan in;

» RECOGNITION AND SAFEGUARDING OF RIGHTS
(Mafen naskirin û parastina mafan)

» RIGHT TO INTERNET ACCESS
(Mafên gihîştina înternetê)

» NET NEUTRALITY
( Alînegirîya şebekeyê)

» PROTECTION OF PERSONAL DATA
(Parastina daneyên kesane)

» THE RIGHT TO INFORMATIONAL SELF-DETERMINATION
(Mafên serbixweyîya zanayî)

» INVIOLABILITY OF COMPUTER SYSTEMS AND COMPUTER DOMICILES
(Mafen destnedanîya sîstem û cîhên kompûterê)

» AUTOMATED PROCESSING
(Neqşên otomatîkbûnê)

» RIGHT TO ONE'S IDENTITY
(Mafên nasnameya înternetê)

» ANONYMITY
(Anonîmbûn)

» RIGHT TO BE FORGOTTEN
(Mafên jibîrbûyînê)

» RIGHTS AND SAFEGUARDS OF PEOPLE ON PLATFORMS
( Maf û ewleyîyê mirovên lî ser serwîsên înternetê)


» NETWORK SECURITY
(Mafên ewlehîya şebekeyê)

» RIGHT TO EDUCATION
(Mafên perwerdehîyê)

» CRITERIA FOR INTERNET GOVERNANCE
(Krîterên îdareya înternetê)

## LI CÎHAN Û TIRKÎYEYÊ BIKARANÎNA MEDYAYA CIVAKÎ

Li gorî rapora ‹Digital 2020›ê ya ku di çileyê de ji hêla We Are Social û Hootsuite ve hatî weşandin, ku raporek hevbeş li ser bikaranîna înternet û medyaya civakî li seranserê cîhanê û li ser bingeha welatan her sal amade dike, 4,5 mîlyar mirovên cîhanê înternetê bi kar tînin, ev ji sedî 59ê nifûsa gloverî ye.




**Çavkanî:** TÜİK

Enstîtuya Îstatîstîkê ya Tirkiyeyê (TÜİK), li gorî daneyên 2019an, rêjeya nifûsa li Tirkiyeyê, 75.3 înternetê bikar tînin. Ev rêje ji bo mêran ji sedî 81,8 û ji bo jinan jî ji sedî 68,9 e. Dema ku daneyên 10 salên dawî têne lêkolînkirin, tê dîtin ku rêjeya bikaranîna înternetê sal bi sal zêde bûye.

Li gorî rapora ‹Digital 2020›ê, li gorî navînîya cîhanê, wextê ku ku bikarhêner rojane li ser înternetê derbas dikin 6 saet û 43 deqîqe ne.


Rojeke navînî li Tirkiyê li ser înternetê 7 demjimêr û 29 deqîqe derbas dibin. Dema ku di navbera 16-64 salan de tê analîzkirin, Tirkîye di navbêna ku li ser înternetê derbas dibe de di nav 42 welatan de di rêza 12an de ye.

Li gorî rapora We Are Social and ‹Hootsuite› Digital 2020›, 3.8 mîlyar mirovên li seranserê cîhanê çalak platformên medyaya civakî bi kar tînin.

Di raporê de wiha tê gotin: «Nêzîkî ji sedî 60ê nifûsa cîhanê serhêl e, û meylên vê dawîyê nîşan didin ku ji nîvê nifûsa cîhanê heya nîvê îsal dê medyaya civakî bi kar bînin,» . Hejmara bikarhênerên medyaya civakî li seranserê cîhanê li gorî sala berê 321 mîlyon zêde bûye. Ev tê wateya zêdebûna ji sedî 9,2.an.

Li gorî raporê, kesek li gorî navînîyên cîhanî, navînî rojê 2 demjimêr û 24 hûrdeman li ser medyaya civakî derbas dike. Ev ji sêyekan zêdetir e ji dema ku li ser înternetê derbas bûye. Li gorî daneyên meha çileyê, li Tirkiyeyê 54 mîlyon bikarhênerên medyaya civakî hene. Ev tê vê wateyê ku li dora ji sedî 64ê nifûsa giştî medyaya civakî bi kar tîne.

## LI TIRKIYÊ PLATFORMA MEDYAYA CIVAKÎ YA KU HERÎ PIR TÊ BIKARANÎN




**Çavkanî:** Rapora We are Social û Hootsuiteê ya bi navê'Digital 2020' ku meha di çileyê de hatiye weşandin.

## LI TIRKÎYEYÊ MAFÊN DÎJÎTAL

Li Tirkîyeyê mirovan ji bo bikaranîna înternet û medyaya civakî maf û berpirsiyariyên xwe hene. Li gorî Qanûna Cezayê (2005) ji benda 132an heta benda 138an dest pê dike. Ev beş bi navê 'Sûcên Li dijî Jiyana Taybet

û Qada Veşartî ya Jiyanê' ye. Bendên ku bi mîjarê ve girêdayî ev in. Benda 134an:  Her kesê ku nepenîya jiyana kesane ya kesane binpê dike, ji yekê heya sê salan bi cezayê girtîgehê tê mehkûmkirin. Ger nepenî bi tomarkirina wêneyan an dengan were binpêkirin, cezayê ku tê birîn yek qatê zêdetir dibe. Her kesê ku bi neqanûnî wêne yan dengên jiyana taybet eşkere dike, ji du heya pênc salan bi zindanê tê cezakirin. Di bûyera ku ev daneyên eşkerekirî di çapemenî û weşanê de têne weşandin de heman ceza tê dayîn.


Benda 136an: Her kesê / a ku bi neqanûnî daneyên kesane li keseke din radigire, belav dike an desteser dike, ji du sal heya çar salan bi cezayê girtîgehê tê mehkûmkirin. Dî Qanûna Muhakemeya Cezayê de jî beşek heye ku wexta hinek sûc bên kirin kîjan pergalan tên bikaranîn. Ev beş bi navê Çavdêriya Ragihandinê Bi Riya Telekomunasyonê ye.

Benda 135an: Di lêpirsîn û lêpirsîna ji bo tawanekê, heke sedemên xurt ên gumanê li ser bingeha delîlên berbiçav hebin ku tawan pêk hatiye û ne mimkûn e ku delîl bi rêyên din bi dest bikeve, pêwendiya gumanbar an tawanbar dikare were sekinandin, tomarkirin û agahdariya nîşanê bi biryara dadrês an dozgerê giştî dikare were nirxandin di rewşên ku dereng ne guncan e de.*** Dozgerê komarê yekser biryara xwe radestî dadgerî/ê dike û dadger biryara wî / wê herî dereng di nav bîst û çar saetan de dide. Di rewşa ku heyam bi dawî dibe an wekî din ji hêla dadger ve biryar tê dayîn, tavilê ji hêla dozgerê giştî ve tê rakirin.

## LI TIRKÎYEYÊ AZADÎYA MEDYAYA CIVAKÎ

Welatiyê ku di serdema ku tesîsên çapemenîya klasîk têne bikaranîn de mijara pasîf a nûçeyê ye, ji nişkê ve ne tenê mijara nûçeyê ye; Di heman demê de, ew rabûye ser rewşa bikarhênereke çalak ku ew jî şîroveyan zêde dike û nûçeyan rexne dike. Vê rewşa nû bingehek ji bo têkiliyeke nû ya awarte di navbera kes û dewletê de amade kiriye, û dewlet di vî warî de amade nehatine girtin. Lihevhatinên qanûnî yên ku di encama çareseriya pirsgirêkên hiqûqî de bilez li Tirkiyê hatine çêkirin bêyî ku mezinbûna bûyerê di rêziknameya navneteweyî ya Internetnternetê de hebe gelek pirsgirêk bi xwe re anîne.

Tirkîye ji berî da ye li ser azadîya derbirîne ne xwediyê profîleke baş e. Di qada medyaya civakî de jî li gorî sînorê xwe tevdigere. Tirkîye di sînorkirina medyaya civakî de di nav hemî welatên cîhanê de di rêza yekem de ye. Li gorî istatîstîkên Dadê, ji 2014an ve, dema ku Serokê Giştî yê AK Partiyê Recep Tayyip Erdoğan wekî Serokomar hat hilbijartin, heya dawiya sala 2019an,



dozgeran bi tevahî 128.872 gilî li gorî xala 299-an lêpirsîn vekir.

## MEE TOO, ÎFŞAKIRIN AN JÎ ÎFTÎRA

Cara yekem çalakvana civakî ya amerîkî Tarana Burkeyê di despêka 2006an de dest bi bikaranîna nîşana «Me Too»yê kir. Dûv re ji hêla lîstikvana amerîkî Alyssa Milanoyê ve di sala 201-an de li ser Twitterê hate populerkirin.

Li Tirkîyê jî dema ku hesabeke Twîtterê ya bi navê Leyla Salîngerê di derheqê nivîskar Hasan Alî Toptaşî de tweet avêt, ev mesele bû pirsgirêkeke nû û popûler. Dûv re ne tenê Toptaş, bi dehan nav ji aliyê jinan ve bi guman û îddîayên destavêtin û tacîzkirinê hatin nivisandin û sûcdarkirin. Ev çalakî bi mafên dîjîtal re gelek eleqedar e ji ber ku li ser medyaya civakî pêk hat û dengê xwe bela kir. Civat li ser vê meseleyê bû du alî; yek ji wan bi rengê femînîzmê tevgerîya û ji ber ku delîl û îspatên destavêtinê pir ne zelal in jin mafdar dîtin. Li aliyê din, ev maf dikaribûn bên sûîstîmîal kirin, çimkî bi serê xwe beyana jinan ne bes bû. Kesên ku li aliyê duduyan disekinin piranî bal kişandin ku her mirovî mafê xwe heye ku bi karîneya bêsuciyê bijî li ber çavê civatê da ku sûcdariya wî/wê teqez bibe.

## MAFÊN ÎFŞA KIRINÊ / BINGEHA BEYANA JINÊ

Qanûna Muhakemeya Cezayê ya 160an: Gumana Sade (Basît), ew wezîfeya lêpirsîna rastiya bûyerê dide. Ji bo vê îdîayê îfşakirin ne derew û buhtan e, ew tenê bi serê xwe îxbar e.

## KARÎNEYA BÊSÛCÎYÊ

Qanûna Bingehîn ya 38an:  Heya ku sûcê wî/wê li dadgehekê neyê pejirandin, kes nikare sûcdar were hesibandin. Ev hikmeke gerdunî ye. Xwedî parastinên vê îddîayê dixwazin ku bêdelîl kes nikare di derheqê yekî de sûcdarîyê bike, eger delîlên xwe hene serî li dozgerîye bidin û bira biryara sûcdarî û bêsucîye aîdê dadger be.

## PIRS

**Mirov dikare çi bike ji bo wan peyamên biheqaret yên ku li ser Instagramê tên?**

*Ji bo vê meseleyê notera dîjîtal heye. Divê tu hesabekê li ser malberê çêkî ku dema ku te xwest dozê vekî wê ji wir ew hesab li ser IPyê tên dîtin û dibin îspata te. Heke VPN tune be IPyê tê dîtîn lê ger VPN bê bikaranîn tu hûn nikarin xwe bigehînin wan.*

**Ger tu ne rojnameger bî jî û bûyerek çêbe tu dikarî wê bûyerê bi kameraya xwe bikişînî?**

*Li derve be tu dikarî bikişînî. Li gorî qanûnê polîsek nikare te asteng bike.*

**Gelek caran polîs li GBTya jinan dinerin û piştre di mecrayên online de xwe digehînin wan jinan? Gelo ew dibe sûîstîmalkirina kare xwe? Mirov dikare dewayê lê veke?**

*Helbet tu dikarî û mafê te ye.*

# HEVOKÊN KOMPLEKS HEVOKÊN RELATÎF

**ÎBRAHÎM SEYDO AYDOGAN***
ZANÎNGEHA INALCOYÊ

*Îbrahîm Seydo Aydogan, ji destpêka sala 2001'ê ve li Fransayê dijî. Di sala 2003'an de, li Zanîngeha Sorbonê, li ser Victor Hugo û romanên dîrokî, bi navê "Parîsiyên sedsala 15'an di Notre-Dame de Parisa Victor Hugo de", lêkolîneke masterê kir. Wî di sala 2006'an de jî, li Zanîngeha Rouenê, tezeke doktorayê li ser "wext, hevokên kompleks û lihevkirina wextan di romanên kurdî de" amade kir. Aydogan heta niha sê pirtûk nivîsandine. Romana wî ya pêşiyê Reş û spî di sala 1999'an de derket. Romana wî ya duyem Leyla Fîgaro, dı sala 2003'an de derket. Îbrahîm Seydo Aydogan di Tishk TV yê de bernameyeke bi navê Wêje amade dikir. Li Kurdistan 24ê bernameya Pencereya Kurdî pêşkêş kir.Ji sala 2007'an ve ye ku li Parîsê li Zanîngeha INALCO di beşê kurdî de mamoste ye û serokê beşa kurdî ye. Pirtûka wî ya bi navê Guman ku ji lêkolînên ziman û wêjeya kurdî pêk tê, bi du cildan ve ji aliyê wesanxaneya Lîsê ve sala 2013'an hate çapkirin.



## KOMPLEKS ÇI YE?

» Ziman wek alava ravekirin û derbirîna wêneyên hişî ye. Rave dike û vedibêje.

» Du celeb vegotin hene: vegotina çîrokekê (wêjeyî), vegotina şîroveyan (rexneyî)

» Mînaka Aristot li ser rola zimanî: armanca gotarê ew e ku peyamekê bi zelalî bide.

» Mînaka Proust û kompleksiya dunyayê: fikir kompleks be, ziman jî kompleks e

» Hiş û ziman û xiyaneta zimanî ya bi hişê mirov ve: mînaka Cratyle

## HEVOKA KOMPLEKS ÇI YE?

» Derfetên zimanî çi ne ji bo nîşandayina kompleksiya dunyayê?

  » Lêker an jî vegotina bûyeran bi kes û tiştan ve hevokan ava dikin

  » Girêdana hevokên cuda bi rêya « gîhanekan » ve

    » Gîhaneka « ku »

    » Gîhanekên din mîna gava ku, heta ku, berî ku, digel ku û hwd. ji bo hevokên peywendîdar

    » gîhaneka û ji bo hevokên serbixwe

## ZIMANÊ DEVKÎ ZIMANÊ NIVÎSKÎ

» Berî her tiştî, divê hesabê teserrûfa zimanî were kirin. Ziman forma hêsan hildibijêre.

» Zimanê devkî hevokên hêsan tercîh dike, an jî hevokên kêm-kompleks.

» Gava ku hevok zêde kompleks be, mirov dikare di wateya wê de zû bi zû dernexe.

» Kamiliya zimanî, kamiliya nivîskêr, kamiliya xwendinê, kamiliya xwendevanan

» Lewma, zimanên mîna kurdî ku di nivîsê de zêde nehatine bikaranîn, van celeb hevokan bi awayê herî besît ve bi kar tînin.

» Ji ber ku nivîskar xema têgihîştinê dixwin û hesabê xwendevanan dikin.

## HEVOKA KOMPLEKS

» Hevokên kompleks ew hevok in ku gellek bûyer tê de hene. (Zend, payiz 2012, r. 39)

» Hevoka kompleks hingê bi du awayan dikare saz bibe

  » Hevok li pey hevokê (hevok azad in, li pey hev an bi hev re ne)

  » Hevok di nav hevokê de (hevok bi hev ve girêdayî ne)

» Ya ku em behs dikin, hevokên kompleks yên weha ne ku bi hevokên pêreyî re hatine avakirin.

## HEVOKA KOMPLEKS Û TERMÎNOLOJÎ

» Hevoka sereke û hevoka pêreyî

» Lêkera sereke û lêkera pêreyî

» Gîhanek

mînak:

Ez dixwazim biçim.

Ez bawer dikim ku ew kurd e.

## CUREYÊN HEVOKÊN PÊREYÎ

» Hevokên pêreyî yên temamker (completif)

  » Ez bawer dikim ku ew kurd e.

» Hevokên pêreyî yên rengdêrî (relatif)

  » Ez zilamekî dibînim ku pirtûkek di destê wî de ye.

» Hevokên pêreyî yên rewşî (circonstancielle)

  » Gava ku baran bariya, xelk êdî nema derket derve.

  » Min kevirek avêt darê ku çivîk bifirrin.

  » Êvarî were bin kozê, ez nîşanî te bidim heft tebeqeyên cinnetê.

  » Beyî ku ji min re bibêje, xaniyê me firotiye.

## RELATÎF Û KOMPLEKSIYA HEVOKÊ Û TÊGIHÎŞTINÊ

“Hevokên relatîf yên herî kompleks in, lewre awayên wan yên sazkirinê di kurmanciyê de ji yekê zêdetir in. Ev hevokên pêreyî bi alîkariya gîhaneka «ku» bi navan ve tên girêdan digel ku hevokên temamker bi lêkerên hevokên sereke ve tên girêdan. Armanca hevokên pêreyî yên relatîf sazkirina komên rengdêrî ye, lê belê ji ber ku di rengdêrê bi xwe de lêkerek heye, ew koma ku bi nav û rengdêran ava dibe, di nava hevokeke din de dibe sedema peydabûna hevokeke kompleks.” *Guman 1.*

## HEVOKA PÊREYÎ YA RENGDÊRÎ AN «RELATÎF» ÇI YE?

» Rengdêr ew alav in ku taybetmendiyên navan, şayesa wan, hejmara wan an agahiyên li ser wan didin.

  » Mala mezin, zilamê navsere, keçika xweşik

» Rengêr teva navê ku dişayesîne, dikare di nava hevokekê de were bikaranîn.

  » Ez maleke mezin dibînim. Ez keçikeke xweşik dibînim.

» Rengêr dikare kirdeyê jî, bireserê jî û alaveke din jî bişayesîne.

  » Maleke mezin li ber mala me ye.

  » Ez pirtûka xwe didim keçikeke xweşik.

  » Li Diyarbekira xopan, zarokatiya min derbas bû.

## KÊ LI SER RELATÎFAN ÇI GOTIYE?

Mijara hevokên kompleks bi navê hevokên hevedudanî ve di nava rêzimanên kurmanciyê de heye. Ji Rêzimana Celadet Bedirxan heta bi rêzimanên herî dawîn ve jî tim xuya dibe. Lê belê, bi taybetî jî hevokên pêreyî yên rengdêrî an jî « relatîf », weke rêzimana Celadet Bedirxan, tim bi çend mînakan ve û beyî nirxandina modeleke hevoksaziyê ve hatine dayin. Lewma, mirov nikare wate û xweza û stratejiya hevoksaziya relatîfan fahm bike.

## KÊ LI SER RELATÎFAN ÇI GOTIYE?

**Güneş KAN YUKUŞ (2017: 68), Gotarên Zimannasiyê:**
“Celadet Bedirxan û Roger Lescot (…) beyî ku rave û şîroveyan bike, bi tenê weku mînak deqên çend nivîskaranji bo hevokên hevedudanî dide. (…) Samî Tan (2011: 315-320) bi hûrgilî li ser vê mijarê rawestiyaye û Îbrahîm Seydo Aydogan (2013: 119-160) bi gotareke dirêj hewl daye ku balê bikişîne ser kompleksiya van cure hevokan. Û weku din Engin öpengin li ser bikaranînên xelet ên van hevokan rawestiyaye û ji bo bikaranînên rast pêşniyazên xwe pêşkêş kirine (2014: 173-208). Lê ev hemû hewildan lokal in û ji rûniştandina qeydeyan piçekî dûr in.”

*Xwastiye lêkolînên berî ya xwe kêm nîşan bide.*

**Mikaîl BÜLBÜL (2016: 23), gotara di kovara Zanîngeha Bîngolê de,**
“Yek ji egerên vê xebatê ew e ku li ser vê devokê û vê mijarê xebateke dîrekt nehatiye kirin. Her çend Îbrahîm Seydo Aydogan di gotara xwe ya bi navê “Hevokên Kompleks” de bi sernavê hevokên relatîf behsa vê mijarê dike jî, ji gelek aliyan sînordar e û her wiha ne li ser bingeheke korpûsî ye.”

*Bi hikumên kêmkir ve hewl dide ku yên berî xwe tune bike, digel ku ew xebata ku ew behsa dike li ser korpuseke berfireh hatiye amadekirin.*

**Ergîn Opengîn (2014: 204), Tîr û Armanc:**
“Têgihiştina berbelav ji rêzimanê di rexnegiriya kurdî de têgihiştineke teng e, rêzimaneke yekreng û bi piranî tayinkirî pêş dibîne, ku bêguman ew cure têgihîştin ji bo paşeroja ziman û edebiyatê xeter in, lewre rê û dirbên geşedan û kemilîna zimanî teng dikin. Bêkêriya boçûnên otorîter li ser reng û rûyê zimanî…”

*Li ser romaneke kurdî hewl daye ku xeletî û rastiyan nîşan bide û behsa hevokên kompleks yên relatîf jî kiriye, lê belê xebatên berî xwe di çavkaniyê de nîşan nedane digel ku hayê wî ji wan heye.*

## HEVOKA PÊREYÎ YA RENGDÊRÎ AN «RELATÎF» ÇI YE?

» Rengdêr dikare bi serê xwe ve hevokek be û di nava hevokeke sereke de cîh bigire. Hingê girêdana bi navdêran re bi rêya ezafeyê ve tê avakirin. Tenê di relatîfên derveyîn de ezafe wenda dibe.

  » Ez mala ku te kirrîbû baş nas dikim.  (teva navdêrê)

  » Yê ku serî li hember min rake, ez ê çavên wî derxim. (teva ezafeyê)

  » Ez keçekê dibînim ku şoqe li serî ye. (serbixwe)

## PROBLEMATÎK AN JÎ PIRSGIRÊK

» Relatîfên kurmanciyê kengî navxweyî ne û kengî derveyîn in?

» Gelo stratejiyeke zelal di cîhê relatîfê de heye an keyfî ye?

## LI SER CELEBÊN RELATÎFAN AN RENGDÊRIYAN

» KLEIBER Georges (1987a), Relatives restrictives et relatives appositives : une opposition « introuvable » ?, Tubingen : Max Niemeyer, 166 p..

» KLEIBER Georges (1987b), « Relatives restrictives/ relatives appositives : dépassement(s) autorisé(s) » in Langages, n° 88, pp. 41-63.

» RIEGEL Martin & alii (1999, première édition 1994), Grammaire méthodique du français,  Paris : PUF, 646 p.

» GARAGNON Anne-Marie et CALAS Frédéric (2002), La phrase complexe : de l'analyse logique à l'analyse structurale, Paris : Hachette, 159 p.

## CELEBÊN RELATÎFAN

**Li gorî erka nava hevokê cureyên relatîfan**

» Relatîfên rengdêrî

» Relatîfên navdêrî

» Relatîfên mercî

**Li gorî şayesandina navdêran cureyên relatîfan**

» Relatîfên derveyîn

» Relatîfên sînordar

## METODA ME

**Hingê**

» 1- Em ê ji aliyê wateya wan ve li relatîfan binerin.

» 2- Em ê ji aliyê sazkirina wan ve li relatîfan binerin.

» 3- Em ê bala xwe bidinê ka relatîf navdêrên bi çi rengî nîşan didin.

## KORPUS

» Ji bo vê xebatê, me korpuseke berfireh amade kiriye.

- » 18 romanên kurmancî
- » Malperên înternetê
- » Çîrokên gelêrî

## RELATÎFÊN NAVXWEYÎ

» Jinikê carinan jî ji bo saxtîkirinê, telefonî cîhê wî yê ku wî gotibû, ew ê lê be, kiribû. (Pêlên bêrîkirinê, p. 75)

» Li dora wî cihekî bikarîbûya cixare jê bikirriya jî tune bû. (Jar lê Sermest, p. 28)

» Kompartiman hinekî tarî ye, eger meriv kesê nexuyayî

yê ko ev foto kişandiye nehesibîne, ji Celadet pê ve tu kesê din naxuyê. (Bîra Qederê, p. 134-135)

» Havînan em diçûn gund. Ez û diya xwe. Bavê min ê ku hertim meşgûl bû û hê jî welê ye, wext nîn bû, bi me re bihata. (Ronî mîna evînê tarî mîna mirinê, p. 157)

» Bi çavzerkê li koma nan ku hilm jê diçû nêrî. (Mîrze Meheme, p. 64)

» Hingê, ew aliyê min î mîrekî, ku bi adet û toreyan perwerde bûbû, xwe da der. (Saturn, p. 38)

» Hemû xebatên wî yên ku bi salan e didomin, ji bo vî karî bûn. (Ardûda, p. 13)

» Tiştê ku bikarîba çemê Xerzan di destpêka biharê de bida sekinandin tunebû. (Gundikê Dono, p. 8)

» Lê tiştekî ku bikaribe bike tune bû. (Av zelal bû, p. 96)

» Hemû xebatên wî yên ku bi salan e didomin, ji bo vî karî bûn. (Ardûda, p. 13)

» Tiştê ku bikarîba çemê Xerzan di destpêka biharê de bida sekinandin tunebû. (Gundikê Dono, p. 8)

» Lê tiştekî ku bikaribe bike tune bû. (Av zelal bû, p. 96)

» Erka rengdêriyê girîng e. Gelo rengdêr tenê agahiyeke derveyîn e an agahiyeke sereke ye. Gelo dibe ku mirov van relatîfên navxweyî weke relatîfên derveyîn bi cîh bike, an di van hevokan de bandora zimanê tirkî heye?

» Tîndayê derî vekir û berî ku têkeve hundir bi dû Sarbayê ku serê xwe bera ber xwe daye û ketiye rê û diçe, nihêrî. (Ardûda, p. 32)

» Diviyabû ku wî hemû pirtûkên ji wan jêderk dihatin wergirtin û di munaqaşeyan de dihatin bikaranîn, xwendibûna. (Pêlên bêrîkirinê, p. 40)

» Ji bilî van etîketan, bi gotineke din, ji bilî van nav û naznavên ku wan li hev kirine, ez ê rengdêr û naznavekî din bi kar neyinim. 67 (Labîrenta Cinan, p. 67)

» Bitenê destê ko dirêjî pertûka li ber bû dît. (Mendik, p. 171)

» Ew fîlmekî ku mirov bi girî dike ye. (Diyarname)

» Min aletên ku tu dibînî çêkir. (…) Min rabû van karkerên te ew dîtin ji xwe afirand. (Ardûda, p. 78)

» Gundiyên ku xwe digêhînin hewara Cindî dibînin ku ziman li wî nagere, deng jê nayê (...) (Labîrenta Cinan, p. 155)

## ENCAMA RELATÎFÊN NAVXWEYÎ

» Bêtir di relatîfen digel bireseran de tevlihevî heye.

» Di relatîfên digel kirdeyan de pirsgirêk kêmtir e.

## RELATÎFÊN NAVXWEYÎ

» Ew fîlmekî ku mirov bi girî dike ye. (Diyarname)
Ew fîlmekî weha ye ku mirov bi girî dixe.

» Min aletên ku tu dibînî çêkir. (…) Min rabû van karkerên te ew dîtin ji xwe afirand. (Ardûda, p. 78
Min aletin (weha) çêkirin ku tu dibînî. (…) Min rabû ev karkerên hanê ji xwe afirandin ku te jî ew dîtin.

## RELATÎFÊN NAVXWEYÎ Û STRATEJIYEKE ALTERNATÎF

» Bikaranîna rendêrên işarkî dikare bibe çareseriyeke pirsgirêka tevliheviyê.

» Lewre, gava ku du lêker (ya sereke û ya pêreyî) digihîjin hevdu, bi taybetî jî lêkerên bûyin û hebûn yek ji van her du lêkeran bin, bandora fiilimsiyên (sifat fiil) tirkî xuya dibe.

## RELATÎFÊN DERVEYÎN

» Belê, ev trêna pêşîn e ku wê niha here. (Ronî mîna evînê tarî mîna mirinê, p. 58)

» Ew mamoste bû ku li Mihemedê Xursî dabû. (Av zelal bû, p. 20)

» (…) li wir çavên wê bi du zarokan dikeve ku li kolanê di nava xweliyê de dilîzin (...) (Labîrenta Cinan, p. 136)

» Tiştin hene ku nayên gotin. (Mîrze Meheme, p. 75)

## RELATÎF BEYÎ NAVDÊRÊ

» Dema wusa xwendevanek diket tengaviyê, kê bersiva pirsê zanîba bi kurdî jê re digot. (Kejê, p. 15)

» Kî dihat dîwanê, mînak fêm dikir (…) (Dewrêşê Evdî, p. 196).

## RELATÎFA BI EZAFEYA RELATÎF

» Yên ku diçûn bajêr bi taybetî pirs dikirin ji dikanan û qehwên Milla lê rûdiniştin û bazirganî dikirin. (Dewrêşê Evdî, p. 183)

» Ya wan jî ji Xwedê dixwest eve bû. (Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, p. 83)

## KIRDE AN BIRESER AN ISTIQAMETA DAWÎN

» (...) kete riya ku wî dibe agahiyê. (Li qeraxa şevê hîvron, p. 17)

» Di îstiqameta dawîn de pirsa cîhê relatîfê zelal e, lewre cîhê îstiqameta ji xwe dawîn zelal e.

## FORMULA RELATÎFAN LI GORÎ KORPUSÊ

» 1- Nav + ezafe + gîhanek + relatîf
Mala ku ez dibînim…

» 2- Nav + ezafe + relatîf
Mala ez dibînim…

» 3- Nav + gîhanek + relatîf
Nan ku bêhna germ jê tê…

» 4- Hevok + gîhanek + relatîf
Ez keçekê dibînim ku çakêtekî sor lê ye.

## AVADANIYA RELATÎFÊN LI PEY HEV

» Sêva ku te da min û min xwar, ne xweş bû.

» Sêva sor a xwes (a) ku te dabû min û min jî nêvî da hevalê xwe, pirr xweş bû.

## AVADANIYA RELATÎFA HIŞMENDIYA TIRKÎ

» Min keçek dît ku kirasekî sor lê bû.
Min keçeke ku kirasekî sor lê bû dît. (hevoka ji tirkî)

» Min sêvek xwar ku te dabû min.
Min sêveke ku te dabû min xwar. (hevoka ji tirkî)

## AVADANIYA RELATÎFA BI HIŞMENDIYA TIRKÎ

» Ez zilamekî dibînim ku te ji min re behs kiribû.
Ez zilamekî ku te ji min re behs kiribû dibînim.(du lêker li pey hev)

» Ev fîlmekî ku mirov bi girî dike ye. (du lêker li pey hev)
Ev fîlmekî weha ye ku mirovî bi girî dike.

## RELATÎFA BI KIRDEYÊN NEDIYAR

» Zilamek hat ku erebeya wî xweşik bû.

» Keçek hat ku kirasê sor lê bû.

## HEGER HEVOK NEGERGUHÊZ BE Û KIRDE DIYAR BE

» Keçika ku kirasê sor lê bû, hat mala me.

» Memedê ku restoranta wî heye, keçikek dît.

Hevoka duyem gerguhêz e, lê relatîf diçe ser kirdeyê.

## NEDIYARIYA NAVÊ KU RELATÎF NÎŞAN DIDE

» Zilamekî ku restoranta wî heye, keçikek dît ku kirasê sor lê bû.
» Zilamekî şîv xwar ku çakêtê sor lê bû.
» Zilamekî ku çakêtê sor lê bû, şîv xwar.

## ENCAMA LÊKOLÎNÊ

**Heger navê ku relatîf nîşan dide navekî diyar be, hingê relatîf pê ve ye û navxweyî ye.**

» Keçika ku kirasê sor lê bû, hat mala me.
» Zilamê ku restoranta wî heye, keçikek dît.

**Heger nav nediyar be, relatîf hingê diçe pişta hevokê û weke relatîfa derveyîn tê bikaranîn.**

» Zilamek hat ku erebeya wî xweşik bû.
» Keçek hat ku kirasê sor lê bû.
» Zilamekî şîv xwar ku çakêtê sor lê bû.

**Di hevokên negerguhêz de, kirdeyên nediyar**

» Keçek hat ku kirasekî sor lê bû.
» Zilamek derbas bû ku porê wî dirêj bû.
» Pirtûkek derketiye ku behsa Kurdan dike.

**Di hevokên gerguhêz de, kirdeyê nediyar dikare bi relatîfa derveyîn ve were şayesandin digel ku bireser navekî diyar e.**

» Zilamekî şîv xwar ku çakêtê sor lê bû.
» Zilamekî pirtûk xwend ku mala wî li Amedê ye.
» Hevalekî ev pirtûk da min ku navê wî Robîn e.

**Di hevoka gerguhêz de, gava ku bireser navekî nediyar be, hingê relatîfa derveyîn, bireserê nîşan dide.**

» Min keçek dît ku kirasekî sor lê bû.

» Zilamî pirtûkek xwend ku behsa Kurdan dikir.

» Min hevalekî xwe dît ku navê wî Robîn e.

» Min pirtûkek da hevalekî xwe ku behsa Kurdan dikir.

**Di hevokên gerguhêz de, heger kirde navekî diyar be jî, heger bireseke nediyar hebe, reatîfa derveyîn bireserê nîşan dide; lewre bireser di ser kirdeyê re ye.**

» Zilamî keçikek dît ku kirasê sor lê bû.

» Min keçikek dît ku kirasê sor lê bû.

» Zilamekî keçikek dît ku kirasê sor lê bû.

» Zilamê ku restoranta wî heye, keçikek dît ku kirasê sor lê bû.

**Relatîfa derveyîn dikare îstiqameta dawîn jî nîşan bike. Lê heger bireseke nediyar di hevokê de hebe, hingê îstiqameta dawîn mecbûr e ku ezafeyê bi kar bîne.**

» Min pirtûk da hevalê xwe yê ku te doh dîtibû.

» Min pirtûk da hevalekî xwe ku te doh dîtibû.

» Min pirtûkek da hevalê xwe yê ku te doh dîtibû.

» Min pirtûkek da hevalekî xwe yê ku te doh dîtibû.

## ENCAMA DAWÎN

**Di stratejiya cîhê relatîfan de, divê mirov bizane ku**

» Relatîfa navê diyar tim pê ve ye û weke relatîfa navxweyî bi cîh dibe, ji ber ku ew relatîfa sînordar e.

» Relatîfa derveyîn tim navekî nediyar nîşan dide.

» Gava ku kirde û bireser bi hev re navên nediyar bin, bireser di ser kirdeyê re ye; hingê, relatîfa derveyîn bireserê nîşan dide.

» Ji bo ku relatîfa navxweyî bêhna xwendinê fireh bike û barê hevokê sivik bike, mirov dikare rengdêrên îşarkî yên mîna weha û hanê bi kar bîne, da ku relatîfa navxweyî bikare weke relatîfa derveyîn were bicîhkirin.

# ROJNAMEGERÎYA EDEBÎ

**MURAT BAYRAM***
BOTAN INTERNATIONAL

* Murat Bayram 11 sal in ku karê rojnamegeriyê dike. Avakarê Botan Internationalê ye û edîtorê ortadogunewsê ye. Ew yek ji avakarên beşa kurdî ya bianetê ye, wî çar salan li wê derê edîtorî kir û dersên rojnamegerîyê bi zimanê kurdî û tirkî daye. Bayramî ji bilî medyaya kurdî ji bo New York Times, Al Jazeera International, Deutsche Welle, Middle East Eye û RT TVyê wêne û vîdeo girtine, nûçe nivîsîne û wergêrî kiriye. Nûçeyên wî li 8 welatan bi 6 zimanan hatine weşandin. Wî li bernameya fellowshipê ya Rojnamegerîya Dîjîtal ya Zanîngeha Oxfordê(Enstîtûya REUTERSî ya Xebatên Rojnamegerîyê) li Ingilîzîstanê û Acadêmie Franceyê perwerde standiye. Zanîngeha Kalîforniayê ya Los Angelesê(UCLA) xelata "Nivîsîna herî afrînêr û orjînal" û Yekîtîya Rojnamegerên Başûrê Rojhilatî xelata "Rojnamegerê salê" daye wî. Bayramî demên qedexeya derketina derve li Cizîr, Silopya, Farqîn, Sûr, Nisêbîn û Şirnexê heyî û piştî wan deman li cihên bûyerê wêne girtine û hin ji wan wêneyan digel çîrokên wan li kitêba xwe ya bi navê "belkî îşev binive" civandine(Weşanxaneya Avestayê, 2018). Kitêba Bayramî ji bo zimanên Ingilîzî, Îtalî, Almanî û Farisî tê wergerandin. Ew yek ji nivîskarên Ferhenga Nûçegihanîya Zayenda Civakî: Kurdî-Tirkî û wergêrê 11 kitêban e. Wî edîtoriya 46 kitêban kiriye.



Edebiyata rojnamegeran û rojnamegerîya edebî du têgehên ji hev cida ne.

Edebiyata rojnamegeran: Ew karên edebî ne ku rojnamegeran kiriye. Rêdûr Dîjle, Kêsek(helbest), Omer Faruk Baran, Şevek îstismar (roman) ji bo vê yekê nimûne ne.

*Rojnamegerîya edebî, ew rojnamegerî ye ku çîroka bûyerekê li ser çîrokeka kesekê/î an jî hin kesan diyar dike.

*Rojnamegerîya edebî, edebiyat û afrînerî ye!

**Edebiyat e: ( Yaşar Kemal, 40 salên roportajnivîsîyê)**

*Çawa beşeka edebiyatê ye an na? Edebiyat bi xwe ye! Hêza ku wê ji nûçeyan cida dike hêza wê ya ji edebiyatê ye… Roportaj afirandin e. Tu bêyî ku biafirînî tu nikarî rastiyê bibînî, tu bibînî jî nikarî ji yên li pêşberê xwe re bibêjî. Nûçe nîşaneka rastîyê ye lê li pişt nûçeyê çi heye, çi çêbûye, jiyaneka çawa heye, çi diqewime, trajedî çi ne, şîn û şahî çi ne… vê yekê nûçe nikare bide me. Roportaj xwe digihîne erdên welê ku nûçe nikare xwe bigihîneyê, rastîyê naguhere lê bi afirandinê pêşkêş dike.*

***- John Berger: Ma** dema rojnamegerek çîrokeka ji xwe heyî dibêjin, afrînerî kiriye?*

**- Susan Sontag:** *Mirov piştî ku dibîne, dibihîse, lêdikole û serwextî çîrokekê dibe. Sanîyeya ku difikire ez ê vê çîrokê çawa bibêjim, dest bi afirînerîyê dike.*

*Ji bo rojnamegerîya edebî bûyer û eşkerekirina rewşekê giring e, dikare nasnameya lehengan veşêre, nebêje an jî navekê li lehengan bike.

*Nûçegihanîyek e ku sebrkêşîyê dixwaze û hewil nade mijarê bilez bigihîne lê hewil dide mijarê zelal bike.

*Edebîbûna rojnamegerîyê ne ji ber gotinên xemilandî ye. Gotinek an jî teswîreka rasterast xizmetê ji gihandina agahîya li ser bûyerê û atmosferê nede nayê gotin, nivîsîn.

*Demanceyek di sahneyekê de bê nîşandan divê ew biteqe! (Robert McKee, Çîrok)*

*Edebiyat bi xwe hûnerek e û estetîk yek ji hîmên wê yên esasî ye. Lê rojnamegerîya edebî ji bo dîyarkirina bûyerekê an jî rewşekê hûner û estetîka edebî wek alavekê, wek pirekê bi kar tîne.

*George Orwell (Çima ez dinivîsim?): Dema ez ji bo nivîsîna kitêbekê dirûnim ez ti caran ji xwe re nabêjim, planeka min heye ku berhemeka hûnerî çêbikim. Lê hin derew hene ku ez dixwazim wan eşkere bikim, dixwazim balê bikişînim ser wan rastiyên berdest û tişta min di destpêkê de dixe di fikarê de jî ew e ka dê guhdarî li gotinên min bê kirin an na.*

Lê heger ne ceribîneka estetîk be ez nikarim kitêbekê heta ku nivîsareka ji bo kovarekê jî binivîsim.

* Bûyerên di rojnamegerîya edebî de ne mecbûr in li gor kronolojîyekê biçin. Hemî agahî û meteryal ji bo gihandina atmosferek û rewşekê bi şêweyê herî sade û zelalkirî tê pêşkêşkirin.

*Rojnamegerîya edebî xwe dispêre kesê/a yekem.

*Cih û atmosferê teswîr dike. Hewil dide hest û rewşa demekê li xwendevanan/bîneran bide zanîn.

*Hestan naveşêre, hestên rojnamegeran bi xwe jî di

nûçe-çîrokê de heye.

*Ti caran ne bêalî ye.

*Paşxaneya mijarê eşkere dike

*Rola rojnamegeran û kesayetîya wan rengê nûçeyê diguhere

*Çavên rojnamegeran kamerayeka ji derve ye, li ser hest û armancên kesan fikran dîyar nake. (Xemgîn dixweya ne xemgîn bû)

*Rojnamegerîya edebî ji dîrok, çand, erdnîgarî …hwd yên cihê bûyerê referansan distîne.

An çîrokbêj/nûçegihan rasterast şahind e. Di wê demê de ku bûyer diqewime rojnameger şahidîyê dike (George Orwell – Bila silav û rêz li Katalonyayê bin, rojên Burmayê, Rojên bêpere yên li Parîs û Londonê… Patrick Kingsley - Odyssseya Nû, Yaşar Kemal - Roportaj)

An jî ji şahidan çîrokê pêş kêş dike lê di wê demê de jî şahidîya xwe ya digel şahidan diyar dike. (Svetlana Aleksiyeviç – Rûyê şerî ne jinane ye, Daniel Defoe - Rojnivîska Sala Vebayê, Nadire Mater – Memed'in Kitabi)

An jî herdu ne (Murat Bayram – Belkî îşev binive, Carlotta Gall - Dijminê Xelet).

## PÎVANÊN NAVNETEWEYÎ YÊN ETÎKA ROJNAMEGERÎYÊ

Sê pîvanên destpêkê ji bo peydakirina agahîyên ji bo nûçeyan e, pîvanên 4,5 û 6ê pîvanên ji bo amadekirina nûçeyan e û pîvanên 7,8,9 û 10ê ji bo mafên bîner, xwendevan û guhdaran e.

» 1-Piştrastkirina agahiyan.

» 2-Bêalîbûn.

» 3-Resenbûn/orjînalbûn.

» 4-Dayina temama agahîyan, nehiştina kêmahîyan.

» 5-Zelalbûn.

» 6-Adilbûn.

» 7-Sînordarkirin û kontrolkirina xwe

» 8-Mirovparêzî

» 9-Agahiyên ku dikare hesabê wê bê dayin, bê hesibandin.

» 10-Bihêzkirina aliyê zeîf/qels.

## HIN NIMÛNEYÊN ROJNAMEGERÎYA EDEBÎ

**The Guardian – Patrick Kingsley – U.K.**
*9 Jun 2015*

**Gera Hashemî: Derseka nefsbiçûkî û qehremanîyê**

Penaberekê ji Sûriyeyê hewil dida ji Behra Spî bibore. Wî destûr da min ku vê hewildana wî belge bikim. Bi vê yekê wî tîrêjek da ser çîrokên bi hezaran penaberên wek xwe.

Ji beriya nêzîkî neh mehan kelekek binav bû, piraniya 500 kesên tê de mirin. Min dixwest ez bizanim ka çawa çêbûye. Ji ber vê nûçe-çîrokê min û wergêrê xwe Manuyî penaberekê ji Sûriyeyê nas kir. Ew 40 salî bû û li derveyî Qahîreyê dijîya.

Hashem digel jina xwe Hayam û sê kurên xwe çûye ser kelekekê. Lê dema ku keleka wan bi cihekê li beravê giradayî bû, polîsan ew desteser kirine. Ew ji xeniqandinê xelas bûne lê li cihekê girtî yê navendeka polîsan zêdetirî hefteyekê mane.

Dema hûn rojnameger bin hin firsetên we çêdibin ku hûn mirovên îlham-bexş nas bikin û ji wan hînî tiştan bibin. Lê hûn gelek ji wan kesan cara duyem nabînin. Lê belê ji ber hin sebeban min peywendiya xwe ji Hashemî nebirî. Ew sebeb ji çêkirina nûçe-çîrokekê mezintir bûn. Di çend-hefteyan de carekê didoyan ez diçûm cihê wan ê li derveyî bajarî û em gav bi gav bûn hevalên hevdu.

Dema ku Hashemî got ew dixwaze xwe bêxe rîskê û bikeve ser rêya seravî ez mat mam. Ji ber travmaya ceribandina wî ya paşiyê ez şok bûbûm. ..



**The Guardian – Patrick Kingsley – U.K.**
*9 June 2015*

**Sefer**

Di tariya şevê de, dema ji beravê gelekê dûr ketîn, Hashem Alsoukiyî yên li rexa xwe nedidîtin lê dengê qêrînîya wan dihat wî.

Hinekê sûcê Hashemî bû ku wek bazên didadin erdê bi ser du jinên Efrîqî de ket. Ixtimaleka mezin ew ji Somalîyê bûn lê ne dema pirsînê bû. Laşê Hashemî di nav laşê wan de asê bûbû. Wan dixwest, wî zû ji ser xwe bavêje, wî jî hewil dida ji ser wan rabe. Lê wî nedikarî. Gelek mirovan ew dehf didan. Îhtimaleka mezin pêleka dî ya mirovan bi ser wan de dihat.

Komeka mirovan di kelekeka darîn de li ser hev hatibûn tepisandin. Dema ku hinekan bixwestiyan cihê xwe biguherin, qaçaxçîyên li derdorê pehînek li wan dida û ew li cihê xwe vedigerandin. Wan nedixwest kelek bilive û bi wê yekê binav bibe.

Çêdibe ku siet 11ê şevê be lê Hashem nikare piştrast bibe. Ew ji dem û mekanê qetiyaye. Nikare teqîb bike...



**Independent - Robert Fisk – U.K.**
*Sunday 28 January 2018 16:45*

**Li Efrînê qurbanîyên êrîşa Tirkiyeyê ya li ser bakurê Sûriyeyê eşkere bû – penaber, bebik, jin û zarok**

Li gundekî biçûk ê bi navê Maabatliyê, dema Taha Mustafa al-Khatr digel jina xwe Zakia, herdu keçên xwe Amîna û Safa û kurê xwe Sulaiman ji bo razin çûyîn mala xwe wan şimik û pêlavên xwe danine ber deriyê xwe. Ev kevneşopîyek e û nîşan dide mal paqij e.

Piştî topeka Tirkan li mala wan dayî ew şimika plastîka a erzan helbet hê jî li ber wî derîyî bû. Piştî teqînê çend sietek borîn ku ez çûm nik wî xanîyî. Dema ez giham wî xanîyî, piştî teqînê çend sietek borîbûn.

Ew pêlav û şimik hêj li wê derê bûn. Çend ji wan ketibûn ser pêlpêlikan lê hê jî hinek ji wan li rexa hev rêzkirî bûn.

Karmendên gihana hawarê yên bajarê Kurdan –Efrînê-jî dest li pêlav û şimikan nedane... Lê bêguman term çûbûn. Taha 40 salî bû, jina wî Amîna jî di wî emrî de bû, Zakiya 17 salî bû, Suleiman bi tenê 14 salî bû. Ya ne mirî Safaya ye. Safaya 19 salî bi awayekê mûcîzewî sax xelas bûye, bi tenê destê wê birîndar bûye... Lê helbet ew êdî sêwî ye...”

**Nexweşxaneya Efrînê...**

Bi tenê ji bo Nexweşxaneya Efrînê 34 sivîl hatine birin, hat diyarkirin ku ji 70yê zêdetir balafirên Tirkan di 21ê Kanûna Paşiyê de li teqemenî li Efrînê dane.

Li gor qeydên Dr. Jawan Polatî dayîn Independentê, ji 21ê Kanûna Paşiyê heta 26ê Kanûna Paşiyê 10 zarok û 7 jin jî tê de 34 sivîl mirine.



# PEYAMNÊRÎYA CENGÊ

**MESÛD MÛHEMMED***
KURDISTAN 24

* Mesûd Mûhemmed, di gelek sazî û rojnameyên kurdan de xebitîye, wek rojnamager û nûçegîhan. Niha jî di Kurdistan24ê de rojnameger û nûçegîhan e.



Li gelek welatên cîhanê da bi taybetî li rojhilata navîn herdem şerr û alozî hene û herdem pêşbînîya şerrên nû tê krin. Ji ber vê yekê jî  pêwîstî bi nûçegehanên çavnetris û wêrek heye.

Dikarim bibêjim di kawdanên em tê da derbas dibin ji bo rojnameger xwe bi pêş de bibin baştirîn beş rojnamegerîya cengê ye.

Li welatê me û li welatên derdora me, bi giştî li welatên rojhilata navîn tang û top derbas dibin û xelk mereq dikin ka li meydanên cengê çi diqewime.

Di jiyana min de gavên herî serkeftî di nûçegihanîya cengê de bû. Rojnameger pirtir bi van nûçeyan bernîyas dibin. Ez ji beriya şerî pirtir li ser şaşeyê dixweyam jî kêmtir kesan ez nas dikirim di dema cengê de ez kêm dixweyam jî pirtir hatim naskirin.

Baştirîn biryara rojnamegerîyê biryara karkirina wek rojnamegerê cengê ye lê divê hûn bizanin ku ev ne biryareka hêsanîye belko carinan yarîyeka bi canê xwe re ye.

Vêca dema ku we biryar da hûn bibin rojnamegerên cengê divê hûn guh bidin van xalan.




## “BIRYARDAN”

Ji beriya her karekê divê biryar bê dayin. Divê hûn ji biryara xwe piştrast bin. Ji ber ku tiştê we bi ser bêxin an jî têk bibin ew biryarêmn we ne. Divê tu ew qasê ji biryara xwe piştrast bî ku bibêjî jiyana xwe jî bi ser de bidim ez ê dest jê neberdim.

## “HILBIJARTINA HEVKARAN”

Divê hûn bizanin ku hûn ne ber bi seyranekê an jî ahengekê diçin hûn ber bi cihekê diçin ku çêdibe hûn ber bi mirinê ve biçin. Divê tu bizanî ku hevkarê te dê bikare di hemî rewşên mandîbûnê û zehmetîyê de bi te re be û karê xwe bike. Çênabe hûn ber bi cihekê metirsîdar ve biçin û ji ber kêmayîya hevkaran karekê ne hêjayî wê zehmetîyê bikin.

Gelek caran ji ber hevkarên newêrek, zehmetîya we dikare li ber avê biçe.



## “XWE AMADEKIRIN”

Ji beriya ku hûn biçin cihê şerekê divê hûn şarezayê wî cihî bin. Yanî divê nexşeyê wî cihî li nik we hebe. Divê çenteyê pijîşkî, divê cilê guleneber li nik we hebe. Li gor min ew kesên ku bêyî cilên guleneber biçin cihê şerî li hemberî xwe ji bo jiyana xwe gunehkar e.

## “PLAN”

hûn biçin cihê şerî divê planeka karî ya we û hevkarên we hebe û divê hûn navenda karê xwe jî jê agehdar bikin.

## “XWEŞKIRINA PEYWENDÎYAN LI CIHÊ ŞERRÎ”

Ji beriya ku hûn karê xwe yê rojnamegerîyê, belgefîlm an jî karekê bi vî rengî bikin, baştir e ku peywendîya we digel serkirdeyên şerî re hebe.  Divê hûn bizanin ku çêdibe hûn careka dî bi wan re kar bikin. Têkiliya xwe neêxin di metirsîyê de.

## “GIHANDINA NÛÇEYAN”

Divê tiştên hûn dizanin hûn ji navenda Tvya xwe re bibêjin. Divê zanyarîyên we peyda kirîn hûn ji temaşevanan re bibêjin.

## “EM DIÇIN NÛÇEYAN BIGIHÎNIN EM NAÇIN BIBIN NÛÇE”

Divê hûn li cihê nûçeçêkirinê de xwe û hevkarên xwe biparêzin ne hewce ye hûn karekê bêmantiq bikin û bi xwe bibin nûçe.



# BEŞA SEMÎNERAN

**MURI DARIDA***
ROJNAMEGERA SERBIXWE, ALMANYA
**DR. ISABEL KASER****
ZANÎNGEHA BERNÊ, SWÎSRA

*Mûrî Darîda Alman-Macar e. Rojnamegerîyê dike. Ew bi 7 zimanan dizane û hema bêje bi hemû zimanan jî rojnamegerîyê dike, ew bi kurdî jî baş dizane û wê semînera xwe bi zimanê kurd3i peşkeş bike. Wê Saykolojî jî xwendiye û li ser derûnîya jinên kurd xebitîye.

**Dr. Isabel Käser, doktoraya xwe li ser tevgerên jinên kurd nivîsîye. Li Zanîngeha Bernê dersên Zayenda Civakî dide. Li Wezaret Karên Derve ya Swîsrayê dîplomat e. Şêwirmenda Botan Internationalê ye.

Yek jî pirsgirêka herî mezin a gelên bindest ew e ku nikarin dengê xwe derxînin, ên ku derdixînin jî mêr in. Girîngtirîn tişt ev e ku divê kurd çîrokên xwe bixwe binivîsin, bêtir jî jinên Kurd. Divê em piştgitîya jinên kurd bikin ku nasnameyên xwe di qada navnetewî ava bikin.

**Muri Darida**

Rolên zayendê her tên guhertin û rewşa nexweşîyê an jî di nav şerî da, rê ji bo jinan tên vekirin. Wek ku di dema şerî de jin rolên giran ku ji meran re hatine tayin kirin hildigrin ser xwe. Lê piştî rewşa dijberî, ew rêk tên girtin. Di rewşên şer û pevçûnan de roleka bilind ji bo jinan jî tê dayin. Lê piştî şerî ew li rola xwe ya berê vedigerin.

**Isabel Kaser**

**ROJNAMEGERÎYA KURDÎ YA DÎJÎTAL**

❖ 2020 ❖

BOTAN INTERNATIONAL

RSF WITH THE SUPPORT OF REPORTERS WITHOUT BORDERS

This project is funded by the European Union